



**V**aşar Kaya:  
"Ew dibêjin  
hûn  
dixwazin

dewleta tirk  
parçe bikin, na  
emnaxwazin  
Tirkiyeyê parçe  
bikin, bila  
kurd li ser axa  
xwe xwedî  
parlementoya  
xwe bin, xwe bi  
xwe bi rê ve  
bibin. Federasyon  
çi ye? Gelê kurd  
û gelê tirk divê  
wekî hev bin.  
Hem bi  
nasname,  
hem bi hiqûq,  
hem jî bi mercên  
jiyana xwe.  
Wekî din fed-  
erasyon adil e,  
gelê kurd ew qas  
şehîd dane,  
federasyon  
heq kiriye.

R. 3

# FRIEDEN



Serokê PKDW'ê  
Yaşar Kaya:

# Emnaxwazin dixwazin

Avûn Öztark:

"Mozaîka Gelan  
ji bo me rûmet e"

R. 8-9

Deham Abdilfettah:

B. Nazê di 'Rêzimana  
Zimanê Kurdî' de çawa ye

R. 4-5


Zülküf Kışanak:

Adirê zerya ma,  
Nazım Babaoğlu

R. 6



## Azadiya WELAT



SAMI TAN

Qet nebe berpîrs,  
xebatkar û xwendevanên  
rojnameyê dikarin  
bi hev re  
alîkariyê bikin û bi  
xebateke dûr û dirêj, hêdî  
hêdî rojnameyê ji nava  
tengasiyan derxin.

## Di dîroka rojnamegeriya kurdî de sê stêrkên geş

Rojnameya Azadiya Welat hefteya çûyî du sal li pey xwe hiştin, kete sala xwe ya sisiyan. Di dîroka çapemeniya kurd de rojnameyên ev qas temendirêj kêm in, piraniya kovar û rojnameyên me piştî hejmaran weşana wan hatiye rawestandî. Ewê ku derketine jî bi rêk û pêk derketine. Di navbera du hejmaran de hin caran sal derbas bûne. Lê rojnameyên ku piştî salên 90'î dest bi weşanê kirin, ew qedera reş guhartin. Bo nimûne, Welat tevî çend navberdayînan jî 115 hejmar bi rêk û pêk derketiye, bi vê hejmara di destê we de, hejmara Azadiya Welat jî dibe 106, heke arîşeyên mezin derkevin pêşberî rojnameyê, em hêvîdar in ku rojnameya Azadiya Welat ji Welat temendirêjtir be.

Rojnameya Azadiya Welat dîwajoya Welatê Me û Welat e. Ev her sê rojname jî berhemên şoreşê ne. Her wekî taybetiyên her sê rojnameyan ên erênî, arîşe û pirsgerêkên wan jî pir hindik mîna hev in. Her du rojnameyên pêşîn digel, êrişên dijmin, ji ber tengasiyên

aborî hatin girtin. Niha rojnameya Azadiya Welat jî bi heman arîşeyan re rû bi rû ye. Sedema bingeşê a vê tengasiyê jî kêmbûna hejmara xwendevanan e.

Sedemên kêmbûna xwendevanan gelek in, gelek nîqaş jî li ser vê mijarê di nav rûpelên rojnameyê de hatine kirin, hê jî tene kirin. Pir kes dibêjin sedema bingeşê êrişên dijmin e, hinek dibêjin sedem bandora bîrdoza fermî ye, hinekên din vê yekê bi sersariya xwendevanan ve girêdidin. Li aliyê din em dizanin ku hinek xwendevan jî berpîrsiyê dixin stûyê xebatkaran rojnameyê. Li gorî xwedyên vê ramanê em nikarin rojnameyê li dîw daxwaza gel amade bikin, her wiha ji bo ku tîkiliyan bi gel re geş bikin, tîrî daxwazan xebat nayê kirin.

Ew bawerî tevî ku hinek rastiyan di nava xwe de bihewîne jî, dîsa diçe digîheje sedema destpêkê, lewre derfetên heyî nahêlin ku xebat geş bibe, kadro bi awayekî pisporî xebatê bikin, kalîteya rojnameyê berzîtir bikin. Dîsa, kêmbûna

hejmara xebatkaran, rê nade ku çend xebatkar ji bo geşkirina tîkiliyên bi gel re bîn terxankirin. Baş tê zanîn ku geşkirina tîkiliyan ji bo weşanê karekî pêwîstîrîn e. Lewre dema tîkîlî xurt bibin, derfetên li ber destê berpîrsên saziyan jî pirtir dibin, her wiha ji aliyê moralê ve jî dema xebatkar piştevaniya gel bibînin dilgeş dibin û xwe zêdetir didin kar. Pişt van gotinan dibe ku yek bibêje, lê çare çi ye?

Çareyeke ji bîrî ve ku di demeke kin de pêk were nîn e, lewre rewşa civaka me di nava çend rojan de naguhere, çapemeniya gelê di nava şoreşê de, wê tu car nikaribe derfetên çapemeniya welatekî azad bi dest bixe. Lê qet nebe berpîrs, xebatkar û xwendevanên rojnameyê dikarin bi hev re alîkariyê bikin û bi xebateke dûr û dirêj, hêdî hêdî rojnameyê ji nava tengasiyan derxin. Li ser xebateke dûr û dirêj hemû xwendevan dikarin dîtînen xwe binivîsîn, emê jî li ser vê mijarê di rojên pêş de ramanên xwe pêşkêş bikin.

## Sala 1998'an ji me re sala serfiraziyê ye

## Ferhengok

<b>ajal:</b> sewal, lawir	garantî
<b>aram:</b> îstikrar, sebir	<b>navmalî:</b> xulam
<b>arîşe:</b> problem	<b>rawe:</b> kîp
<b>berwenda:</b> ortayolcu	<b>raberzîn:</b> çatmak
<b>binhiş:</b> bilinçaltı	<b>raborî:</b> paşeroj
<b>bizir:</b> tov	<b>raberkirin:</b>
<b>cindî:</b> qeşeng, çeleng	pêşkeşkirin
<b>dabaşkirin:</b> behskirin	<b>ramîn:</b> fikirin
<b>çej:</b> tam	<b>rêbaz:</b> medot, azîne
<b>dahûrandin:</b> analiz	<b>nîgarbûn:</b> neqîşbûn
<b>derûnî:</b> psîkolojî	<b>rist:</b> rol
<b>dêhn:</b> serinc, bal	<b>serdem:</b> heyam
<b>diwaroj:</b> ayende(gelecek)	<b>sersarî:</b> xemsarî
<b>diyarde:</b> kirû, (olgu)	<b>stûr:</b> qalîn
<b>dijber:</b> muxalif	<b>spartin:</b> sparte (ödev)
<b>dîr:</b> dintir	<b>palandin:</b> rafînekirin
<b>dûhamîk:</b> dawî	<b>paxav:</b> xem, telaş
<b>ezimandin:</b> ağırlamak	<b>pêşniyar:</b> pêşniyaz, öneri
<b>jiberkirin:</b> ezberkirin	<b>pîrsiyar:</b> pîrs
<b>jimar:</b> reqem	<b>puxte:</b> özet
<b>havildar:</b> bikêr	<b>pol:</b> sîmf
<b>hêvoşkar:</b> perwerdekar	<b>vafînî:</b> peywîr
<b>hindikahî:</b> kêmnetewe, (azınlık)	<b>vehesîn:</b> bêhnvedan
<b>kan:</b> kaynak	<b>wane:</b> ders
<b>lasayî:</b> teqlît	<b>terxankirin:</b> veqetandin
<b>lîloz:</b> berfîn	<b>têgîn:</b> têgih, kavram
<b>mêjer:</b> pîrhêjmar û yekhêjmarî	<b>zayend:</b> cînsiyet
<b>misogerî:</b> teqez,	<b>zêder:</b> qertaf, ek

GAFUR DOĞAN

Serê salê binê salê, ev sal bibe aşî û xêr ji hemû bindestên cihanê re. Di jiyane de tiştên nû, her dem hêviyê bi xwe re tînin. Di jiyane de serhildanên nû û şerên diwar, aşî û azadî her dem bi xwe re anîne.

Sala ku li dawî dimîne her dem kevn dibe, salên ku li paş dimînin ji bo nîrxandinê ne û çî kemasî tê de çêbûne analîza wan tê çêkirin. Lê tiştên nû tim û tim paqijî tê de heye. Mirov planên xwe ji bo pêşerojê çêdike.

Sala 1997'an bi hezaran gundê şewitandî, bi milyonan mirovên penaber, malên xerakirî, çiya û banîyên bê mirov, pezên şewitandî, mirovên kuştî û laşê tev bi xwîn. Yê ku di îşenceyaneyê de hatine kuştin, yê ku di bin çavan de hatine windakirin. Kovar û rojnameyên belavkirî, sazgehê çandî û deriyê wan mohrkirî, hunermendên dest û ling qeydkirî, guhê tijî pembo, çavên wekî tasan, lê belê şevreşkî, zîmanê dirêj û di ber de qutkirî, siyasethanê serê şahîtok û binî tijî bîhok. Karkerên dest qelişandî û zikê wan ê birçî, çeteyê di nav dewletê de; qehreman ê serbilindkirî, aşîxwazê hepiskirî, xortê binçavkirî, qatîlê serbestkirî, zagonê wek lastîkê firehkirî, heq û hiqûqa windakirî, mirovê robotkirî, mêjî zingar û paskirî. Di roja aşîyê ya dinyayê de mirovên copkirî. Sala 1997'an ne ev tenê ye, ev hîn nîna ye, timîna bi dû de ye.

Ji bo ku van nepenî bikin, heta ji wan hat pakê derxistin, pakête cixara kirin qereborşa, pakêten nû derxistin. Di wan pakêtan de çî hebû çî tunebû, rahmet li dê û bavê min û we bû. Lê rehmet ne li dê û bavê wan be.

Wilehî tiştên ku li dijî kurdan bûn, gişt tê de hebûn, nema dicivî ser hev. Heger ku qetîya bûna, pine dibû, lê ev bûye berbat, cihek di siyaseta wan de serrast nemaye. Kumê Elo dixin serê Celu, dîsa çênabe, her du kum jî qetîne.

Osman Daş bi nexweşiyekê ket û şehîd bû. Greva birçîbûnê li girtîgehan nêzî du mehan berdewam kir. Ji bona ku ev bê şermezarkirin, Mirza Mehmet Çimen xwe şewitand.

Di sala 1997'an de çî bû û çî nebû, îşallah em nebînin. Ku mirov serokê welatekî be, mirov di konferansa îslamê de çî negire bibêjin, bi wîr de tu bêdestmêjî î. Dewletên Ewropa pîvaz spî kirin, qeşartin xistin destê Mesut. Îcar camêran li xwe dananî ku bêje wan em nexistine Yekîtiya Ewropayê. Dibêje ku, jixwe dilê me jî tunebû ku em tekevinê. Hem ji derê bûn hem ji mizgeftê. Berwenda man (orta yolcu) Di sala 1997'an di meha gulanê de ketin Başûr, di serî re ketine û di binîre derketin. Mayê ku li Başûr bûn beq diqesandin? Bi xêra Mesut û Çiler ez

hînî demsalan jî bûm. Her ku demsalêk xelas dibe, em dibêjin îcar xilas bûn.

Qey sal bûye pênc demsal, hayamin jî tune ye. Heke ez ez im, qala roja nehşemiyê dikin, yan jî heta qatir bizên û heft kerê şamî pev re bizirin, wê demê "terorîst" gişt xilas dibin. Çiqasî derewan dikin xelk ji wan re çepika dixin. Di salekê de ji sedî sed û pêncî buhayên tiştan zêde bûn. Di medya direwîn de wiha dibêjin: "Tu kes li wî welatê birçî tune ye."

Suleyman beg digot: Heger li wî welatî kevirêk jî wînda bibe, em xwe berpîrs dibînin. Ev sê sal in ku Dayikên Şemiyê, li ber deriyê Lîseyaya Galatsarayê rûdînin, li zarokên xwe digerin.

Osman Daş bi nexweşiyekê bê eman ket û şehîd bû li ber çavên hemû kesan.

Greva birçîbûnê nêzî du mehan berdewam kir li girtîgehan. Ji bona ku ev werê fehmkirin û bê şermezarkirin Mirza Mehmet Çimen xwe şewitand.

Xwedyê pisîkê dibêje sala 1997'an baş derbas nebû, ji bo çî? Pisîka wî tîr kezeb nexwar ji ber vê yekê. Ji bo Kongreya Neteweyî gavên yekê hatin avêtin. Yekîtiya hunermendan hat damezîrandin. Weşana televîzyona MED derket 18 saetan. Her ku diçe gelê kurd ber bi pisporiyê ve diçe. Di her warî de sazî cihê xwe digirin. Sala 1998'an ji me hemûyan re sala serfirazî û serketîtinê be.



Serokê PKDW'ê Yaşar Kaya:

# Em niha federalîzmê dixwazin

"Ew gotin ne gotina min e, ez nizamim ku wan ev gotin ji ku derxistine, Divê ew kes bi awayekî durist nêzîkî çareseriyê kêşeya kurd bibin. Divê pêşniyarên xwe bi awayekî vekirî bibêjin. Kesên ku ji siya xwe ditirsin nikarin ji bo çareseriyê bibin alîkar."

Heta niha kurd wekî gelekî hindikahî jî nehatine dîtin. Ji mafên bingehîn ên mirovî bigirin, heta mafên neteweyî tu tişt ji kurdan re rewa nehatiye dîtin. Lewre li gorî bîrdoza fermî kurd tirkên çiyayî ne. Piştî serhildanên gelêrî rayedarên dewletê dest bi nîqaşa realîteya kurdan kirin. Lê bi pratîkê di vî warî de tu gav nehatin avêtin; ji bilî çend raporên Dema mirov bala xwe dide wan raporên jî, mebesta tefandina agirê rizgariyê xwe dide der.

Tevî vê yekê jî hinek ji wan raporên bûn sedemên nîqaşa kêşeya kurd û li ser reaksiyona derdorên faşîst amadekarên van raporên bi paş ve gav avêtin û xwe li dîtin û ramanên xwe derneketin. Hefteya çûyî jî bûyereke bi vî rengî qewimî. Di bultena Komeleya Karsazên Ciwan ên Tirkiyeyê de bi sernavê "Kürt Sorunun da Olası Çözümler (Hinek çareseriyên Kêşeya Kurd)" nivîsek hate weşandin. Di nivîsê li ser gelek modelên çareseriyê hatiye rawestîn. Ji ber ku nivîskarên nivîsê du akademîsyen in (Kemal Kirişçi, Goreth M. Winrow), nivîs jî bi şeweyekî akademîk nêzîkî mijarê dibe. Her çiqas di nivîsê gelek model; ji serxwebûnê bigire, heta pir-çandiyê di nava nivîsê de cih girtibin jî, mirov tê derdixwe ku mebesta nivîskaran pûç derxistina doza azadîxwaz e. Lewre her çiqas nivîskar xwe li derveyî hemû dîtinan bidin nîşan jî, di dawiyê de hatiye gotin ku çareserî pir-çandî ye.

Tiştê balkêş ku bû sedema nîqaşan jî gotinên bi rengê "di roja îroyîn çareseriyê berfireh bêtî beşdarbûna PKK'ê ne gengaz e..." Di berdewama hema pasajê de tê gotin ku PKK geşedana kêşeya kurd li qada neteweyî û navneteweyî de rola PKK'ê divê neyê jibîrkirin. Tiştê ku hêjayî gotinê ye jî ev e; piştî ku ev nivîs di çapemeniya kurd de bû nûçe, berpîrsên komeleyê daxuyaniyek dan û diyar kirin ku ew nêrin ne ên wan in, wan nêrinan jî napejirînin. Xuya ye ku di guherîna helwestê de, tirs xwedî giraneyê mezîne. Tevî ku xwert xwe bigihînin berpîrsên komeleyê jî, ji ber heman sedemê wan xwe neda ber vê yekê û bi tenê sekreterê xwe dan gotin ku ew bi vî dîtinê re ne.

Her wekî me di destpêkê de dabû xuyakirin, bi gelemperî di nivîsê mebesta marjînkirina tevgera azadîxwaz xwe dide der. Li gorî nivîskarên nivîsê, tevgera kurd û mebusên DEP'ê demokrasiyê naxwazin, tahamûla wan ji bîr û baweriyên cuda re nîn e. Dîsa nivîskar îdia

dikin ku kurd bi piranî PKK'ê wekî nûnerê xwe nabînin. Nivîskarên navborî dixwazin vê gotina xwe jî bi agahiyeke ku ji rapora TOBB'ê girtine biselminin.

## Murat Bozlak: Min tiştêkî wisa negotiye

Li gorî lêpîrsîna TOBB'ê %9.4'ê kurdan xwestiye ku PKK di nav pêvajoya çareseriyê kêşeya kurdî de cih bigire. Di berdewama heman hevokê de tê gotin ku Serokê Giştî yê HADEP'ê Murat Bozlak bi awayekî watedar diyar kiriye ku divê qala hevdîtina di navbera PKK û hikûmeta tirk de neyê kirin. Li ser vê yekê me xwe gihand Bozlak û dîtinên wî girtin. Bozlak bi awayekî hêrs diyar kir ku ew dîtin ne dîtinên wî ne. Serokê HADEP'ê gotina xwe wiha domand: "Min tiştêkî bi vî rengî negotiye. Heta niha tu nûçegihanekî ve kovare an jî endamekî TÜĞİAD'ê bi min rûneniştîye û li ser çareseriyê kêşeya kurdî tu pîrs ji min nekîrin." Her wiha Bozlak daxuyand ku wî gotineke bi vî rengî li tu derê, ji kesî re negotiye. Murat Bozlak da zanîn ku ew nîzane ku wan ev gotin ji ku derxistine, her wiha Bozlak got ku ewê li ser vê mijarê bi berpîrsên nivîsê re têkiliyê deynin û hesabê vê gotinê bipîrsin. Li ser nêzîktêdayîn kesên ku nivîs nivîsîne jî Serokê HADEP'ê ev nîrxandî kir: "Divê ew kes bi awayekî durist nêzîkî çareseriyê kêşeya kurd bibin. Divê pêşniyarên xwe bi awayekî vekirî bibêjin. Kesên ku ji siya xwe ditirsin nikarin ji bo çareseriyê bibin alîkar."

Di vî nivîsê tiştê balê dikîşîne pîrbûna modelan, gelo bi rastî kîjan model jî bo kurdan guncaw e? Dema mirov bala xwe dide gotar û nivîsên ku li ser vî mijarê hatine nivîsîn, tê dîtin ku kurd li dorê serxwebûn, federalîzm û otonomiyê nîqaşên xwe didomînin. Piraniya rêxistinên kurd êdî otonomiyê jî bo kurdan napejirînin. Heta bigihêje, rêxistinên başûrî û rojhilatî yê ku ji mêj ve jî bo otonomiyê şer dikin jî, êdî doza federalîzmê dikin. Rêxistinên bakurî bi temamî doza serxwebûn û federasyonê dikin. Bi tenê hin derdorên reformîst îro qala modela pir-çandiyê dikin. Li ser vî mijarê me xwe gihand Serokê PKDW'ê Yaşar Kaya û dîtinên wî standin.

Kaya li ser vî mijarê bi awayekî vekirî dîtin û ramanên xwe dan xuyakirin: "Parçebûna kurdan hem ji bo Tirkiyeyê û hem jî ji bo cihanê bûye mijareke gelekî girîng. Dewleta tirk kurdan înkâr



dike, kurd mafên xwê dixwazin, şer dikin, bi pey çanda xwe dikevin. Êdî hemû bi kêşeya kurd hesiyaye. Gelê kurd dixwaze li ser axa xwe azad bijî." Serokê PKDW'ê dide zanîn ku PKK'ê bi têkoşîna xwe bi cihanê daye pejirandin ku ew nûnerê gelê kurd e. Her wiha Kaya wekî modela çareseriyê jî federalîzmê pêşiyar dike. Yaşar Kaya dide xuyakirin ku wî bi xwe li parlamentoyên gelek dewleta ew daxwaza bi awayekî vekirî aniye zimên. Kaya bi van gotinan detayên modela ku dixwaze jî rêz dike: "Ew dibêjin hûn dixwazin dewleta tirk parçe bikin, na em naxwazin Tirkiyeyê parçebikin, bila kurd li ser axa xwedî parlamentoya xwe bin, xwe bi xwe bi rê ve bibin. Federasyon çî ye? Gelê kurd û gelê tirk divê wekî hev be. Hem bi nasname, hem bi hiqûq, hem jî bi mercên jiyana xwe. Wekî din federasyon adil e, gelê kurd ew qas şehîd dane, federasyon heq kirine." Li gorî daxuyaniya Kaya, Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan jî gotiye: "Werin em vî komarê bi hev re ji nû ve saz bikin û bi hev re bi rê ve bibin, bila mafên kurdan jî, yê tirkan jî hebin, bila her du jî bikaribin siyasetê bikin."

Serokê PKDW'ê Yaşar Kaya ew gotinên Demirel ên bi şeweyê "Em divê ji Adriyatîkê heta Çînê yekîtiya xwe çêbikin", bi bîr xistin û got ku mafên kurdan jî heye ku ji bo Kurdistanê serbixwe yekîtiya xwe li her çar parçeyên Kurdistanê çêbike.

Piştî van gotinan jî Kaya got, divê hemû model bîr nîqaşkirin, piştê jî got: "Bila werin em li hev rûnin, nîqaşê bikin, kîjan model baş e, em li ser li hev bîr." Li gorî agahiyan Yaşar Kaya hinek rojnamegerên tirk telefonî wî kirine û gotine: "PKDW federasyonê dixwaze, ew dijwar e", li ser vî yekê Kaya jî gotiye: "Werin em li ser tiştêkî din bipeyivin, tiştên hêsantir hene."

AZAD ALTUN

## Kurtenûçe

Rewşa girtiyên Girtîgeha Giresûnê ya Tîpa E, ku ji 8'ê rêbendanê ve di greva birçîbûnê de ne roj bi roj xerab dibe. Ji girtiyên Ali Altun, Hayrettin Altug û Adnan Arslan ji bêtaqetî û nexweşiyên din ketine rewşekê xedar. Nûnerên girtiyên daxuyandin ku berpîrsê van yekî midûrê girtîgehê Zihni Baş e. Girtî diyar dikin ku Zihni Baş ji bo hevdîtinên wan jî dibe asteng û bi fermana wî xwarinên ku ji wan re tên tene bela-wela kirin.

Înstîtuya Çapemeniya Navneteweyî (IPI) bi navê "Azadiya Çapemeniyê-1997" raporek weşand. Rêxistin di raporê de radigihîne ku Tirkiye, di nav dewletên ku azadiya çapemeniyê û mediyayê binpê dikin de, cih digire. Rapora IPI ku tê de rewşa çapemeniya 150 dewletan tên nîrxandin, ji bo Tirkiyeyê 2 rûpel hatine veqetandin û tê xuyakirin ku Tirkiye, di warê demokratîkbûnê de sozên ku dane di 97'an de jî bi cih neanîne. Wekî tê zanîn berê jî vî rêxistinê daxuyaniyên bi vî rengî di raporên xwe de weşandibûn û Tirkiye di xêzeke xerab de destnîşan kiribûn.

Îtîrafkarê PKK'ê İbrahim Babat ku beşdarî gelek cinayetên faîlî meçûl bûye, ji Lijneya Teftîşê a Serokwezîriyê re axivî. Di ifadeya xwe de Babat behsa cinayetên li Kurdistanê pêk hatine û JITEM ê kir. Babat dibêje ku ew bûye serokê beşek ji JITEM ê, ku kesên alîkarî û piştigiriya PKK'ê dikin dike. Her wiha îtîrafkar Babat dide zanîn ku general Veli Küçük di sala 1990'î de dibe serokê JITEM ê. Li gorî gotinên Babat wan di nav 5 mehan de bi dehan kesên welatparêz kuştine.

Berpîrsên 30 rêxistinên, ku di nav wan de Serokê AKIN'ê Kanî Xulam û Seroka Yekîtiya Mafên Mirovan a Amerikayê Kathryn C. Porter jî hene, serî li Sekreterê Giştî yê Neteweyên Yekbûyî Kofi Annan dan. Berpîrsên sazî û rêxistinên demokratîk jî Annan daxwaz kirin ku, ew alîkarî û piştigiriya bide pêşniyara "Konferansa Navneteweyî a Kurdan." Wekî tê zanîn di rojên derbasbûyî de piştî kurdên ku koçberî İtalyayê bûbûn, dewleta İtalyayê jî dewletên Ewropayê daxwaz kiribû ku konferanseke Navneteweyî jî bo kurdan li dar bixin.



# Bavê Nazê di "Rêzimana Zimanê Kurdî" de çawa tê dîtin?!

DEHAM EBDILFETTAH

**B**i sernavê 'Rêzimana Zimanê Kurdî' Bavê Nazê pirtûka xwe ya bo fêrkirina zimên, ji xwendekar û şagirtên rêzên (polên) 3-8'an re, amade kiriye. Pirtûk ji 44 waneyan (dersan) û bi 160 rûpelên mezin (16x26) pêk hatiye. Rûpelên pirtûkê bi 15 dîmenên kurdewarî, di bin navê "Welatê xwe nas bike" hatine xemilandin. Ji bilî wan dîmenan jî, çend wêneyên alîkar, di nav rûpelên pirtûkê de hene. Pirtûk ji weşanên 'Axîna Welat'ê û di gelawêja 1996'an de li Moskovê hatiye çapkirin.


Pirtûka Bavê Nazê, bi vê rexistinê hatiye der:

Li jora rûpel, Bavê Nazê jimara waneyan "Dersa-1,2.. Dersa 44" nivîsiye. Û li jêrî dersê, mijara xwe bi tîpên girnîvîs daniye. Pêşê di çend rêzan de, pênasiya mijarê rave dike û çend mînakên jî, wekî nimûne, berçav dike. Li pey nimûneyan, Bavê Nazê puxteya (xulasa) ravekirinê kurtebir dike, da ku xwendekar û şagirt, xalên herî girîng ji ber bikin. Heger ramanekê girîng di waneyê de bêtî şirovekirin mabe; yan ji xalekê balkêş tê de zelal nebûbe, hingê "şanek"(têbînî), wê kêmasiyê sergihayî (temam) dike. Di hîndek waneyan de, Bavê Nazê, li dawîya ravekirinê, deqekî (tekstekî) "helbest, gotinên pêşiyên, metelok" bi sernavê gotina "bixwîne" tîne û ji şagirtan dixwaze ku wî deqî bixwînin û bersiva pirsên wî bidin.

Ev pêngavên ku me nîşan kirin, tev di hundirê xwendîngê (dibistan) de, di navbera mamoste û şagirtan de pêk tên. Lê ku şagirt diçin malê, Bavê Nazê karekî di bin navê "spartin" dide ber wan. Di 'spartin'ê de şagirt bersiva xwestekê jî, bi waneyê ve girêdayî ne.

Li dîmahîya hîndek waneyan, Bavê Nazê çend bêtîyan ji şêwezarê(\*) kurmanciya jorîn û ya jêrîn, bi navê ferhengê zimanê me beranberî hev dike.

Bi vî şêweyê nûjen û kurtebir, Bavê Nazê rêbaza ravekirina waneyên pirtûka xwe, li gorî pêwîstiya demê, pêşçav dike. Berî ku em li ser duristî û neduristiyên naveroka pirtûkê rawestînin, em dikarin bi gotineke gelemper bibêjin: Ev karê ku Bavê Nazê daye ber xwe, karekî zor girîng û pêwîst e û şêwazê ku Bavê Nazê waneyên pirtûka xwe pê ravekirine jî, şêwazekî pêşketî û havildar e. Lê di bawerîya min de, mirovek bitena xwe, nikare vî barê giranbiha bibe dawî, bêtî ku bikeve kêmasiyan.



**Heger ku her du şêwezar kurmancî bin, yan jî na..., her du kurdî bin; gelo çima beranberî bêtîyan "sorani" yên ku di kurmancî de nîn in, yan jî nayên bîra me, em di kurmanciya xwe ya "jorîn" de bêtîyan biyanî bi kar tînin, tevî ku ew bêtî, di kurmanciya me ya "jêrîn" de berdest in?!!**

Piştî ku me pirtûka Bavê Nazê bi xwendevanan da nasîn, niha jî, em dixwazin, bi hev re, naveroka pirtûkê bi-

pelînin. Pirtûka Bavê Nazê "Rêzimana Zimana Kurdî" taybetîyeke wê yê navnas (mumeyez) heye. Ew jî ew e, ku

pirtûk bo fêrkirina zimên hatiye amadekirin. Ev fêrkirin jî, bi şêweyê taybetî, di navbera mamoste û şagirtan de pêk tê. Ango pirtûka rêzên polên xwendeghan e. Ji ber vê girîngiyê jî, ji me tê xwestin ku em bi hûrbîni li ser wê rawestînin. Û têtîyan xwe jî, der bare naveroka wê de bêtî dilxwestin, yan nedilxwestin pêşçav bikin.

Li ber ronahiya vê baweriyê..., û berrîya her gotinê jî, ez dixwazim ji bargiraniya vê pirsê vehesim:

Gelo şêwezarê (zarava) "kurmancî" û yê "sorani" li ser asta neteweyî li ku digihêjin hev?! Û li ku ji hev vedigerin?! Gelo, rast her du jî, du reh in (jorîn, jêrîn) ji yek kokê şax-vedane?! Yan jî, her yek ji wan şêwezarekî serbixwe ye?!

Gelek nivîserên kurdan, Bavê Nazê jî yek ji wan e, der bare her du şêwezaran de dibêjin "kurmanciya jorîn û ya jêrîn". Ev navlêkirin gelekî cihgirtî û kurdewarî ye. Lê mixabin tev li vê navlêkirinê jî, hêj em dîrî kakila mebesta xwe ya netewî dimînin...!

Heger her du şêwezar kurmancî bin, yan jî na..., her du kurdî bin; gelo çima beranberî bêtîyan "sorani" yên ku di kurmancî de nîn in, yan jî di bîra me de nayên çima em di kurmanciya xwe ya "jorîn" de bêtîyan biyanî bi kar tînin, tevî ku ew bêtî, di kurmanciya me ya "jêrîn" de berdest in?!!

Bavê Nazê, li şûna "wane" û "deq" a "kurmanciya jêrîn" bi tîpên girdek, "Ders" a erebî û "Tekst" a latînî bo fêrkirina zimanê kurdî, dixebitîne. Gelo çima...?!!

Di pirtûka Bavê Nazê de, gelek peyven biyanî, nemaze yên erebî hatine xebitandin, wekî "sinif, xislet, tamam, xisûsiyet, famkirin, mesder, mane, nefî, xîlaf, temyîz, hicet, halet, demc, wext û hwd..."?!!

Gelo rast zimanê kurdî, heta vê rastê (radeyê) lawaz û xîzan e?!

Bavê Nazê, xwe bi giştî sipartiye "Rêzimana Zimanê Kurmancî", ya ku Celadet Bedir-Xan ew kiriye bîngeha rêzimanê. Piraniya rêzan (qeyd) û navlêkirinên mijarên pirtûka Bavê Nazê, ji "Bîngeha rêziman..." a Celadet hatine wergirtin, wekî pronav, nuqte, nuqteşan, pronavên îşarkî, nuqtecot, nuqtebihnok...".

Tevî ku ev navlêkirin hemû, bi zimanê kurdî, di pirtûkên rêzimana kurdî de hene jî:



Cînav, xal (rawest), xaleşanî, cînavên nîşandan, xalecot, xalebêhnok...."

Bêguman, Celadet zimanzanekî zanîyar e. Lê Celadet rêzimana xwe, beriya 50 salî di Hawarê de belav kiriye. Hege Celadet niha rêzimana xwe binivîsiya, gelo dê çawa binivîsiya?! Û piştî 50 salên dîtir, gelo neviyên me, dê çawa binivîsin?!

Di warê nivîsînê de jî, gerek pirtûka rêzimanê, bêyî şaşiyên zimên bête amadekirin. Gerek jî carekê pirtir li ser destnîvîsara wê bête rawestan. Lê mixabin, ev yek jî pirtûka Bavê Nazê re pêk nehatiye.

Di rûpela 38'an de, Bavê Nazê dibêje: "...Dêra Zehferanê... destpêka sedsalên 7'ande hatiye avakirin. Ew 5 km dûrî bajarê Mêrdînê ye. Dêra Zehferanê jî her sê aliyên xwe ve çiya ne...."

Di van çend hevokan de 7 kêmasî(şaşî) peyda dibin.

1-Gerek pêbesta(daçeka) 'di' berî 'destpêka' bihata nivîsîn.

2-Peyva 'sedsal' ê, bêjeyê hev-bend(hevedûdanî, lêkdayî) ye. Û bi wateya "sede, çerx"ê tê xebitandin. Ev bêje, wekî navekî serbixwe, bi kar tê û li gora mêjer û zayenda xwe (mêzaya yekjimar) veqetandeka xwe distîne Bi şeweyekî di, sedsal jî wekî "roj, hefte, meh, sal" tê xebitandin. Û wekî wan jî zêdera xwe, di hevokê de digre. Lê Bavê Nazê zêdera pirjimarê "ên" sipartiye wê, 'sedsalên'.

Di baweriya min de gerek "... di sed-sala 7 an de" bihata gotin. Çunkî dema avakirina "dêrê, destpêka sedsalêkê bû. Ew jî, sedsala 7 an bû.

3-Di vê hevoka de 'Ew...5km...dûrî bajarê Mêrdînê ye' gerek nîşandekê verêşê(tewangê) 'an' li pey berjimara 'km' bihata danîn. Ango: 'Ew 5 km'an dûrî bajarê Mêrdînê ye'.

4-"Dêra Zehferanê jî her sê aliyên xwe ve çiya ne".

Di vê hevokê de, dû wateyên hev-dij(dijî hev) peyda dibin:

a) Wateya hevokê:

1-"Dêr, jî her sê aliyên xwe ve çiya ne.

2-Dêr(....) çiya ne

3-Dêr....çiya ye. 'Ev jî ne rast e.'

b-Wateya ku Bavê Nazê dixwaze bibêje:

"Her sê aliyên Dêrê çiyane".

Nexwe, gerek Bavê Nazê bigota:

"...Her sê aliyên Dêra zehferane çiya ne."

Di darsa 17 rûpelê 51ê de, Bavê Nazê sernameya babeta xwe, wisan nivîsiye:

"Pronavê pirsiyarkirî"

-Bêjeya "pirsiyarkirî" bi şaşî hatiye xebitandin.

Mîna keke kiriyarî:

"ez jî te pirsayî dikin: kî çû?"

Di vê hevokê de:

1-Ez: Pirsiyarker e.(yê dipirse)

2-Te: berpirsiyar e.(jê tê pirsîn)

3-Kî: pê lê pirsiyarkirî ye.

(bi 'kî' yê, li 'kî', ê, a çû pirsiyarkirî ye).

Nexwe:(pronavên pê lêpirsiyarkirî) ev rawe jî "pê -lêpirsiyarkirî" zivir û necigirt ye. gerek Bavê Nazê, yek jî van hersê raweyan bi kar anibe:"Pirsiyarî, pirsiyarê, pirsiyarkirî."

-Di mijara "veguhestina lêkeran" de demên lêkeran û raweyên xweste daxwaziyên wan(sixeyên telebî), li nik Bavê Nazê, tevhev kirî ne. Û têveliya di navbera wan de, zelal nebûye.

a-Di rûpelê 19 an de, Bavê Nazê bi sernameya "Veguhestina lêkeran di wexta bihurî de, ya li ber çavan" van nimûneyan dide:

1-"Min xwend- Te xwend- Wî/wê xwend- Me xwend- We xwend, Wan xwend.

2-"Ez çûme( ez çûm). Tu çûye(tu çûyî). Ew çûye( ew çû), em çûne(em çûn), Hûn çûne(Hûn çûn) Ew çûne( Ew çûn)".

Û di rûpelê 97 an de jî, Bavê Nazê, di bin sernameya "Veguhestina lêkeran derbasbûyî û yên nederbasbûyî, di wexta niha ya bihurî de, van nimûneyan dide:

1-Min xwend. Te xwend, Wî/Wê xwend. Me xwend. We xwend, Wan xwend.

2-Ez çûme. Tu çûye. Ew çûye. Em çûne. Hûn çûne. Ew çûne.

Beranberî vê veguhestinê, çend têbîniyên me hene:

a-Gelo, çi têvelî(îxtîlaf) di navbera veguhestina lêkeran de, di wan her dû demên Bavê Nazê de heye?!

Di "wexta bihurî ya li ber çavan" de:

-Min xwend...

-Ez çûme(Ez çûm)..

Û di "wexta niha ya bihurî" de

-Min xwend...

-Ez çûme...

Di navbera van her dû raweyên veguhestinê de, ka çi têvelî heye?!

b-Di rûpela 80'yî de û di wexta bihurî ya li ber çavan de, Bavê Nazê, van nimûneyan dide:

"Ez çûme- Ez çûm. Tu çûye- Tu çûyî. Ew çûye-Ew çû. Em çûne- Em çûn. Hûn çûne- Hûn çûn. Ew çûne-Ew çûn."

Di vê veguhestinê de, du alozî hene: 1-"Ez çûme" û "Ez çûm". Ev her dû rawe, di yek demê de nayên. Her yek jî wan di demeke serbixwe de, tê xebitandin:

"Ez çûm":Di dema buhêrka têdayî(berdest, berçav) de, hatiye veguhestin.

"Ez çûme": di dime nêzbuhêrkê de hatiye veguhestin.

2-Bi cînavê "tu" re "î" dighêje lêkera veguhestî. Ne durist e ku bête gotin "tu çû". Ya rast, ku bête gotin:

"tu çûyî", di buhêrka têdayî de. û "tu çûyîye" di nêzbuhêrkê de.

Ji hêlêke di jî, Bavê Nazê demên veguhestina lêkeran û raweyên veguhestina xweste daxwaziyên wan, li nav hev dixê.

Di zimanê kurdî(kurmancî) de her lêkerekê sergihayî(temam), di 6 demên naskirî de tête veguhestin. Ew dem jî, li gora navlêkirina piraniya zimanzanan, ev in:

1-Nuha(nuhok): Ez dixwînim.

2-Duwaroj(dema tê):Ez ê bixwînim.

3-Buhêrka têdayî: Min xwend.

4-Nêzbuhêrk: Min xwendiyê

5-Buhêrka berdewam: Min dixwend.

6-Mêjbuhêrk: Min xwendibû. (\*)

(Wê dom bike)

## Nûçegihanê girtî yê Amedê

FAYSAL DAĞLI



Di kilameke kurdî de min guhdarî kiribû; dengbêj bi êşa sirgûnê dinaliya û mirina li welat wekî mirineke pîroz bi nav dikir. Wesîyet dikir ku dema mir, wî li bin şiya dara gûzê a gundê wî, veşêrin. Dema jî bihara Kurdistanê behs dikir, xweziya xwe bi mirîna wir dianî û bi keserekê kûr, hesreta wê axê ku rengê xwe jê standibû, dianî zimên.

Gelo sedemê vê cazîbeyê çi bû, ku çosa êrişê dida milîtanan, xeyalên xwekuştinê dibêxand helbestvanan û kilamên dengbêjan bi notayên bi hesret dinexand.

Çend sal berê, li Deriyê Mêrdînê di bin siya Sûra Amedê de, dema me li vê kilamê guhdar dikir, hestên me jî bi Dijleyê re diherikîn dîr. Kurdistan dema jî nûçeyan dibetilî û ber bi tariyê êvarê ve dimeşiya, me nûçegihanên Amedê car caran xwe diavêt kevîyên Dijleyê. Bêdengiya Hesên a wekî diwarê sûrê hişk, ma di bîra min de.

Hesên Özgün, nûçegihanekî kurd e. Di sala 1990'de li Amedê dest bi nûçegihaniyê

kir. Ji ber ku şerefa gelê xwe û welatê xwe parastiyê hîn jî di zîndana Aydinê de girtî ye. Karmendên dada dewleta tirk, 13 sal cezayê girtîgehê dane Hesên. Ji ber ku di rojnameya Özgür Gündemê de xebitîye û pişt daye berxwedana netewî, ew tawanbar kirine.

Hesên di sala 1993'an de tevî 150 hevalên xwe yê rojnamevan, ku di nav wan de Gurbetelli Ersöz jî hebû, hatibû girtin û ji wê rojê wir ve, di zîndanên de bedela rojnamevaniya Kurdistanê dide.

Ew niha tevî bi dehan hevalên xwe li ser ranzayên xwe yê ku li bin pacên li çiyayan û li Amedê dinêrin rûniştîye û di îmtîhana berxwedanê de ye. Û rewşa tenduristiya wî xera bûye. Hesên ji ber mercên xirab ê zîndanên tirk, bi nexweşiyên ku jiyana wî tehdît dikin, ketiye. Saziyên çapemeniya navnetewî û rêxistinên humanîter bi bîra dewleta tirk dixin ku, jiyana wî tenduristiya wî dibin berpirsariya dewletê de ye. Û jî sedemên nexweşiya wî, pêwîst e bê berdân. Lê dewlet, li aliyekî ve vê daxwazê red dike, li aliyê din jî, bi destê hekimên xwe, raporên sexte belav dike û dibêje, "Hesên Özgün ne nexweş e". Ji aliyekî din ve jî li hember jiyana wî teslîmiyet û pişmaniye datîne ber wî.

Hesên jî kevneşopîyeke berxwedêr hatiye, ku zalimên nedîtî, nikaribûne serî pê bitewînin. Û helbet ew jî, bi şantajên wiha teslîm nabe.

Em tevî Hesên li kolanên Amedê mezin bûn. Û tevî hevalên wî yê rojnamevan, Hafîz Akdemir û Mehmet Şenol. Hesên û hevalên wî, Burhan, Önder, Haşim, Bakî, Fuat, Haydar û Leyla, zarokên Amedê yê ji granît bûn. Ew hostayên dilsoziyê yê deyndayîna welat û bajarên xwe bûn. Perçeyê herî giran-biha di xezîneya mêjiya wan de, cesaret û fedakarî bû. Wan digot ku ê ne mîrxas be, nikare bibe xwedî baweriyê jî.

Belê, Hesên, bi vê baweriyê, li geliyên ku xwedê kor kiribû dixist û balafirên ku gerilayan anîbûn xwar, resmdikir, derdiket bilindahiyên ku hişê mirov dibirin û ji wir nûçeyên leşkerên dîl dianîn. Bi arama pêxemberan peyv hece bi hece li ser kaxizan dineqîşandin.

Hevalên wî yê ku di nav destên wî de can dan, bajarên ku li ber çavên wî hatin kuştin, xwîna ku ji welatê wî diherikî, ava polaya dilê wî bû. Wî û hevalên wî, di bûroyên dorpeçayî de, kevneşopîyeke rojnamevanî ya zêrîn diyarî dîroka Kurdistanê kirin, ku li rûyê cihanê minakên wisa nehatîbûn dîtîn.

Hesên Özgün niha di zîndana Aydinê de, bedela vê kevneşopîyeke dide.

Belê Hesên Özgün, bi hêviya hevdîtina rojekê li paytexta azadiyê, li Amedê, li Deriyê Çiyê, li bin siya peykerê şervanê bînav.... Heta wê rojê...

Silav û serkeftin.



Adirê zerya ma;

# Nazim Babaoğlu

**Ê** pay de winî bî, mabendê sûka Sêwreg de. Esmer bi çehar serî û çehar serî yo, inan ra xeber nêvejyê. La belê şarê ma wo zaf rind zano ke, çimkewt û sûtali, kewtê goniya inan. Ma yê inan û çinêbiyina inan qe xo vîra nêkerê. Ez emel kena ke, iyê tim û tim jî zerya şarê xo de ebi rûmetê xo ya weş bimanê. Embaz Nazim Babaoğlu, Hüseyin Taşkaya, Ahmet Kalpar, Faik Kevci, Fethi Yıldırım û ê binî. Ê heme jî ezmanê Kurdistan de bî astarik û iyê ewro melûl melûl ezmanê Kurdistanî de akewnê. Nê embazan ra jewerî jî dest de, çek çinêbi û heme jî sivîlî bî. La belê, ewro Sedat Edip Bucak o, ebi qetlê nê embazana camêrdin keno û dewleta tirk ra vano: "Mî Leyla Zana îxbar kerd û dê dest. Min nêverada PKK şaristanê ma de sere hewado. Min ebi namê dewletiya şarê xo rê hesûrey kerd û nêverada şar dekewo raya şoreşê Kurdan. Zew bî şîma, çiçi waşt ke min nêardo ca, qandê çiçi şîma yê mi tersnenê û xof danê min?" La belê, ma dîroka xo ra jî zanê ke, dewleta Roma reş het, qîmetê îxanetey hindê kutikê kûçan çiniyo. Roma reş rind zana ke peyniya îxanetey de weşîna kewtî esta. Çimki nê sûtalan bê şahadetê des pancês welatperweran qet çiyê nêkerdo û nêşenê bikerê.

Nazim bahdoyê lîsey, Riha de rojnameyê Özgür Gündemî de dest bi rojnamegerî kerd. Xeylê bibi ke na şaristan de xeftiyayê. La belê, o hewna embazeko ciwan bi û fitnê kontrayan newe newe silasnayê, coka goniya ci zaf girêyayê. Ey şew û roj ebi çimanê xo ya, qîlêrîna lecê dewlata Tirk diyê û rojname de nûsnayê. Bê nûsnayin hindê sereyê darzîn jî aleqeyê ey û lecî çinêbi. La belê ey, çiyê ke zîrar dayê welatê ci, şarê ci rê hesûrey kerdê, ebi zerya pakina ardê çiman ver. O rojnamegero asil û wayirê qelesa ebi rûmet bi. Ey het, tersê berdûşan û çeçelan rê, ca çinêbi.

\*\*\*

Embaz Nazim Sêwreg ra bi. peynameyê Babaoğlu na sûk de weş yeno silasnayin. Piyê ci İbrahim Babaoğlu TİP ra, birayê ci yo gird İrfan Babaoğlu û birayê ci yo bîn Burhan Babaoğlu PKK ra silasnayayê. Hûrdina birayê ci jî hewna girotxananê tirkî de. Embaz Nazim heme kişt ra jî, hewl abiyaye û her gi roj xebatanê xo de, ver bi ver şiyê. Rojname de embazan qandê ey, wina vatê: "Nazim weş abiyeno, o her gi roj rojnamegerî de xo dewisneno. Wa tayna welat de bipeyşo, bahdo ma yê ey, bancê mabênê rojnameyî." Çi heyfo ke, no mabên de, embazê ma wo delal Kemal Kılıç Riha de, raya dewa Kûlince ser de şehîd kewt. Şahadetê embaz Kemalî tepya gurweyê buroya Rihay kokra kewt milê Nazimî. Zewbî jî embazî buro de estî bi, û xeftiyayê. La belê mesûleteya buroy Nazimî de bi. O jew fin tenya jî mend, la belê ey rojê jî rojnamî rê problem nêvet û hesûreteya dişmenî ra jî, rojê nêtersa û ling

pey ra nêçekerd. Serê ci tayn bi, la belê zerya ci zaf girdbî û ebi xeftiyayinê xo ya ters da xayinan.

Ma jew sûk ra biyê, coka rojname de jû fin ma persê pê kerdê û ameyê pêhetek. Eke Stenbol de, eke Riha de beno, çend finî ma pêya mendî. Ma wexto ke ameyê pê hetek, ma sûkijan sero zaf kuşat kerdê. La belê Nazim zaf milayin bi û ci fek ra qisey zora vejyayê. Ey qisan ra vêşî hez nêkerdê, û taynekê jî embazanê pîlî ra şermayayê. Qewmê ma miyan de sûkijên ma, zaf wextal aysiyenê û kiştî xusefî ra jî zaf teng yenê zanayin. La belê embaz Nazimî no xusetî nêweş, weşîna xo de veng vetê. Ez bi xo emel nêkena ke ey, weşîna xo de rojê jî lecê kerdî û jew merdim şikito. Ey dişmenê xo rê jî nêzanayê xerabinê bikerdê. Wexto ke min ci ra vatê: "Ti sûka ma ra niyê embaz. Tiyê ne qahriyenê, ne qîrenê û ne jî kesiya lec kenê. Ka kotî de mend sûkijîna to, eza kotî ra bizana ke, ti sûka ma ra yê?" Nê vatenan ser, wiyayê û wina vatê: "Bewn embaz, eke ma heme tûjî bê, no fin ma yê bêtam bimanê. Eke şekir nêbo, no fin ma yê bêtam bimanê. Kiştî kuşetî ra qewlê min ebi hûmaya babetna virazyawo." Ebi raştîya jî, Nazim şîrin bi û Nazim tamê ma ya newî bi.


Wekto ke embazê ma wo hêja Kemal Kılıç şehîd kewt, ma hîrê embazî Adna ra, Mehmet Şenol û jew embazîya piya Amed ra, a şew ameybî Riha. Bi şewra, ma Muhsin Melikî ya piya pêserameyin virast, ke meytê embazî ebi vengê û ebi paykewtina şariya hewadê. La belê polîsan meytê embaz Kemalî, nêweşxanî ra tirit û berdî dewa ci Kûlince ke, bêveng bidê her. Winî jî bi, ma hewna ciwîn di biyê ke, nêweşxanî ra xeber amê ma rê ke polîs û eskerî Kemalî benê dew. Mehmet Şenol, Muhsin Melik û embazê binî ya, ma kewtî, meytî pey, la belê hela ke ma resay ci dewijan embaz dabi her. Ma her jewerî, ancî heweyê, di wiyey her çekerdî mezeli ser. A roj kepirê Heranî ebi esrekan û polîsanê tirkîna bibî pir. Ma ra û şarî rî, zaf zaf vêşerî esker û polîsî, ê erdan miyan de bibî rêz. Bahdoyê dihîr ma ageyray, buroya rojnamey. Ma senî ke kewtî zerî, no fin polîsan buroy rê vardayin virast û zey wahşan eşti ma ser. Na vardayin de, ser polîs ebi qahra wina qîrê: "Nûnerê ney buroy kamo, wa bivejyo werte?" Ma weyna embaz Nazimî piheta verpersê serpolîsî wina da: "Ewtiyade keso ser çiniyo, tiyê qandê çiçi qîrenê? Vizêr Kemal nûner bi, la belê ewro ez biya nûner, şimayê mara çiçi wazenê, persê xo bike." Senî ke embaz Nazimî verpersê xo ebi vengo qîrîna da, serpolîs finê ra bi sist û wina vat: "Ma wazem, bewnê maseyê Kemalî ke, kiştîxan ra şopê bivînê. A bîn, ma wazem kiştîxanê embazê şîma bivînê. Vêşî meqahrê ma ra."

Min ewna ke Mehmet Şenolo cayê xo de nêvindenno. Min kerdê bivatê Şenol vindê wa Nazim înanan qisey bikero ke, Şenolî xo çekerd werteyê buroy û wina qîra

polîsan ser: "Şo kardê xo la, tiyê qeçikan xapeynenê, tiya cayê kiştîxan o. Ma zanê kamî embazê ma kiştî. A nika jî, kiştîxanê Kemalî ebi midûrê to ya raqî şemenê, qandê çiçi tiy zey meran kewnê qulanê masî? Sifte şîma verpersê ma bidê." No fin min û Nazimî xo çekerd Şenol ver ke, vêşî teşxele gird nêbo. Ma û polîsan zereyê buroy de kewtî pê miyan. Hindê nîm saatê tepya, polîsan namê min û Şenolî û buroy ra abiryayî. A roj Nazimî winî zerî dabi ma ke, ez qet xo vir nêkena.

Embaz Nazim hindê diwês mengî Kemalî tepya Riha de xeftiya. Her gi roj ver şiyê. Kotî de xebêr bibiyayê o şiyê. Qandê gurweyê rojnamey û xebiran, o şiyê heme ca. Di rojî verê roşanê Rojî, roja 12'yê adara 1994'yê de, psîkopato ke nameyê ci Murat Yoğunlu yo buroy rê çend finî pêşero telefon keno û wina vano: "Sêwreg de jew xeber esto. Heq niheq wa jew rojnameger bêro. Eza embazî rojnameyê İrfanî de pawena." embazî jî Nazimî rişenê. Nazim nişeno dolmiş û şîno Sêwreg. Nazim, dolmiş ra ulu Camî hetek de yeno war û şîno rojnameyê İrfanî. ewneno ke rojname giroteyo, ageyreno cayê beledî. O wija de jî kesî nêvînenno. Ewja ra no fin şîno Şeytan kuçesî ke jew silasnayeyî ra persê Muradî bikero. Weyneno ke kesî di rojî ra nata, Murad nêdiyo. No fin Nazim kewno qaxidê Muradî û xof geno. Wexto ke teseliya ci Muradî ra kewno, wazeno verê êreyî ageyro Riha. Şeytan Kuçesî ra kewno ray û şîno xaraj ke binişo dolmişa Rihay. O hewna nêreseno xaraj, qontra wo ke namê ci Lütfi Küçükbayrak o embazanê xo ya, ey ebi dolmişa kuhoyina remnenê. Lütfi Küçükbayrak û embazê ci sifte Nazimî benê emniyet. Nazimî şewê emniyet de tepşenê û bahdo jî benê dewa Mehemedê ereban. Qontray hindê panc rojî dewa Alanqoz de, kê Mehemedê ereban de tepşenê û keyî miyan de girêdanê. Hefteyê tepya, no fin embazê ma benê kê Sedat Edip Bucakî, dewa Sahdin. Ew ja de jî çend rojî keyî bin de işkence kenê û roja roşanê kurdan, 21'ê Newrozî de kişenê û ey çekenê awa Feratî (Ro).

Ma çahar embazî qandê vînbîyîna Nazimî, şiyê Sêwreg. Ez, Ferda Çetin, Bayram Balcı û parêzger Ramazan Özkaya. Ma 14'ê adarî de şîm Sêwreg û ebi midûrê emniyeta Sêwregî ra qisey kerdî. Ez teberdê emniyet de menda, la belê embazê binî kewtî zerî û ebi midûrê emniyetiya



qisey kerdî. Polîsî Murat Yoğunlu anê embazan hetek û embazan hetek de ci ra persê Nazimî kenê. Murat wija de wiyeno û wina verpersê xo dano: "Ez ne Nazimî û ne jî Rojnameyê Özgür Gündemî ra kesî silasnena. Nîna, bêbextîna kenê û kewnê gunayê min." Midûrê emniyet jî wina vano: "Ma sekerî, şîma jî dî ke, laceko vano ez Nazimî nêsilasnena. Ancî ma şimarê se vajê. Eke şîma wazenê, ma Muradî bidê işkencî. La belê ma emel nêkenê Murad o Nazimî silasneno." Nê mabên de ma se ke, nê ke Edip Sedat Bucakî qandê pêdiyîna, randewû nêda ma. Bahdo Murad wija ra berdî û riştî keyî. serê tepya Murat Yoğunlu ebi biraciniya xo ya zîna kerd û ebi biraciniya xo ya birayê xo kişt. Nika jî qandê kiştîna birayê xo girotxanî de rakewnno. Ewro Edip Sedat Bucak, qandê dawanê çeteyan mahkîma beno. Lütfi Küçükbayrak jî Sêwreg de welatpereweran dima geyreno.

La belê ma yê hewna embazê xo yo delal û hêja Nazim Babaoğlu pawenê. O yo tim û tim zerya ma de weş bimano. Nazim nêmerd, ya xayinî?

ZÜLKÜF KİŞANAK



9 reşemî 1988:

### □ Rojiya mirinê dest pê kir

Li girtîgeha Amedê, ji bo rakirina îşkenceyê û li dijî qedexeya li ser mafên girtîyan, girtîyan tevî malbatên xwe dest bi rojiya birçîbûnê kir. Di roja 11'în a rojiyê de, hêzên dewletê ji bo ku greva girtîyan têk bibin, dest bi sirgûnkirina dîlan kir. Di pêvajoya vê sirgûna bi îşkence de, dîlê bi navê M.Emin Yavuz, li rîya girtîgeha Aydinê şehîd ket. Vê bûyerê li seranserê Tirkîyeyê deng veda. Grev bi serkeftina dîlan qediya.

### BÛYERINE JI DÎROKÊ



13 reşemî 1988:

### □ 12 reşemî 1983 Enstîtuya Parisê vebû

Di sala 1983 reşemîya 13'an de li paytexta Fransa Parisê Înstîtuya Kurdî ava bû. Wê demê li vî bajarî navdar 12 rewşenbîrên kurd hatin cem hev û biryara damezirandina saziyê bi vî rengî girtin. Çend navên girîng ji wan rewşenbîran ev bûn: Îsmet Şerîf Wanlî, Cegerxwîn, Kendal Nezan, Yılmaz Güney, Ordîxanê Celîl, Hacıyê Cindî, Hêjar, Qanatê Kurdo, Remzî, Osman Sebrî, Tewfîk Wehbî û Nûredin Zaza.

# Aborîzan Ahmet Kaya: Kurd divê aboriya neteweyî saz bikin

Xebatkarê înstîtuya Kurdî a Stenbolê Aborîzan Ahmet Kaya, da zanîn ku kurdan her çiqas di gelek waran de xwesazkirine jî lê di warê aboriyê de xwesazkirina kurdan qels û lawaz maye. Kaya di semînera xwe de ya ku roja 28'ê rêbendanê li NÇM'ya Beyoğlu da, gotinên Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan "Di warê aborî de divê kurd xwe saz bikin" bi bîr xistin û diyar kir ku, pêwîst e kurd di zûtirîn demê de vê yekê pêk bînin. Semînera navborî li ser rewşa aborî ya Kurdistanê bû. Kaya di vê semînerê de der barê raborî û diwaroja aboriya Kurdistanê û polîtîkayên Tirkîyeyê yên li ser Kurdistanê dîtin û ramanên xwe anîn zimên.

Di destpêka axaftina xwe de Kaya bal kişand ser ajal-xwedikirina kurdan û got ku welatên ku Kurdistana dagir kirine di vî warê de aboriya xwe li ser piştê kurdan dimeşînin. Li gorî agahdarkirina Ahmet Kaya mêrg û çêregehên Kurdistanê di nav dewlemendtirîn mêrgên cihanê de cih digirin. Piştî van nirxandinan wî da xuyakirin wekî hemû dewletên mêtînger, dewletên ku Kurdistan dagir kirine jî Kurdistanê wekî welatekî hejar û xizan nîşan didin. Kaya da zanîn ku dijberî vî baweriya pûç, Kurdistan ji aliyê kanên sererd û bînerd ve dewlemend e. Lê welatên mêtînger van karan bi tenê ji bo berjewendiyên xwe bi kar tînin.

Aborîzan Ahmet Kaya li ser raboriya mêtîngêkirina Bakurê Kurdistanê jî rawestiya û ew serdem bi serdem weha kategorîze kir.

Sala 1925-1940: Kurdistan ji hêla leşkerî ve tê dagirkirin. Serhildana Agirî, Dersimê pêk tê û mahkemeyên îstiklalê û mufetişên umumî dest bi xebatê dikin.

1940-1960: Kurdistan bi temamî tê dagirkirin. Pêşengên kurdan tînin bêtîsîrkirin û karan iktisadî yên Kurdistanê tînin desteserkirin.

1960-1980: Komîteya Yekîtiya Neteweyî tê avakirin. Projeya Köy-kent ji hêla Bülent Ecevit ve tê pêşniyarkirin. Ew bi vî projeyê dixwaze zeviyan bigihîne ser hev û pişaftina



gelê kurd bi bandortir bike. Ev projeya Alparslan Türkeş bû û armanc bi leztirkirina pişaftina kurdan bû.


Di bernamêyê de Kaya li ser polîtîkayên Turgut Özal ji axivî. Li gorî Kaya, bi projeya GAP'ê hatiye xwestin ku çavkaniyên Kurdistanê ji bo berjewendiyên Tirkîyeyê bînin bikaranîn. Li gorî jimarên ku Ahmet Kaya raber kirin, %35 pêwîstiya enerjîya Tirkîyeyê li GAP'ê tê hilberandin. Her wiha welatên wekî Îsraîl, Amerîka û holdingan li hêrema GAP'ê dest bi xebatê û çalakiyên aborî kirine û bi baldarî li ser vî projeyê radiwestin.

Di dawîya bernamêyê de Kaya li ser karbidestên kurdan sekinî û ew veqetandin sê koman: "Hin ji wan karbidestên dibêjin: Em jî rojhilatî ne, hin ji wan dibêjin: Em kurd in, lê Tirkîyeyî ne. Koma din jî dibêje em kurd in û karbidestên kurd in. Ev kesên ku dibêjin: Em karbidestên kurd in, wekî tê zanîn ku hinek ji wan hatin kuştin. Jixwe Tansu Çiller di axaftineke xwe de gotibû: "Ezê birjuwaziya kurd a neteweyî ji holê rakim". Lê bi têkoşina tevgera azadiyê gelek tişt hatin guhartin."

AZADIYA WELAT/ STENBOL

### ÇAVDÊRÎ

## Îdrîsê Bedlîsî, Siwariyên Hemîdiye û ceşîtî



MÎRHEM YÎGÎT

Lêkolîner Osman Aytar roja 17/1/1998 an li Înstîtuya Kurdî ya li Stocholmê bi alîkariya birêveberiya Înstîtuyê semînerê li dar xist. Semînerê bêdar û germ bû, tê de mînaqeseyên xurt çêbûn.

Xwenaskirin û lixwekolîn di nav pirsên rojane û serokî de tînin. Kurd tarîfa xwe dikin, ji nuh ve xwe bi nav dikin û bi awireke cihê derbasbûna dinirxînin, heldisengînin.

Her hewla navandin û wezinandina her avahiyeke ku duh çêbûye yan jî îro heye wekî hevkarîya Îdrîsê Bedlîsî, Alayên Hemîdiye û ceşîtîya serdema me divê çend pirsan ji xwe bike:

- 1- Kê çêkirine û çawa çêbûne?
- 2- Armanc û fonksiyona wan çi bû, çi ye?
- 3- Pratik û kirinên wan yê dawî çawa bûn, çi kirin, çi dikin?

Kesê ku dibêje Îdrîsê Bedlîsî baş kir, kurd kirin yek. Divê ewil li ser bersiva van her sê pirsan hinekî birame, biponîje. Saziyên ku bi destê dijminan bînin çêkirin, ji aliyê dijmin ve bînin finansîkirin, mimkûn e gelo ku ji bo qencî û berjewendiyên mirov tîbikoşin?

Ji ber ku bersiva van pirsan di zemanê xwe de nehatiye dayîn, yan jî nivîrê û mane, li hemberî tiştên xerab û li dijî me, tiradîsyonek (kevneşopî) çêbûye ku çend sed sal in domdar e.

Hevkarîya Îdrîsê Bedlîsî gawek cidî ye ber bi Alay û Siwariyên Hemîdiye de. Ev hevkarî bûye alîkar ji bo ku Alayên Hemîdiye hêsantir çêbibin. Ceşîtîya zemanê me jî piştê xwe dide Alayên Hemîdiye. Heger em jî li ser van pirsan zelal û sayî nefîkîrin jî vî xayîntîya nav xwe rizgar nabin. Jiyanêke bi vî rengî jî malkambaxî û ketin e, derdê bêderman e.

Adet û elaqê hevkarîya bi dijmin re di nav me de zihniyet û şexsiyeteke ecêb jî çêkiriye. Nimûne zehf in: Sal 1877 e. Malbata Bedirxaniyan li surgûnan e. Dewletê ew mîna noka tu li kevir bixî, belavkirine. Her çendek avêtine deverekê. Şerê nav Osmanîyan û Rûsan derdikeve. Şamil Paşayê kurê Bedirxan ji Stenbolê û cihên din li dora 3000 Kurdên xizan kom dike, dikeve pêşîya wan û li aliyê Osmanîyan dikeve şer. Kurdên ku pê re şer dikin qir dibin, kerên wan di korên wan re derdikevin û ew jî bi 25 birînan birîndar dibe û seqet û perîşan vedigere.

Sal 1912 ye. Zarokên Mala Cemil Paşa li Siwîsreyê ne. Berpîrsên rêxistin û Kovara Hêvî ne. Şerê Balkan û bi dû de ji yê cihanî derdikevin. Sultan fermîna dike ku nesekînin û bînin eskerîya xwe bikin. Xwendayên me nabêjin wê çi bi mesûliyeta rêxistinê bê, qet paxavek wiha nakin, lê dixin û vedigerin. Çiroka wan dirêj e. Dibin esker, dibin yawerê Mustefa Kemal, di cephê rojhilat de birîndar dibin, bi dû şoreşa Ş. Seîd de tîne girtin û piştê ew qas tiştê hê nuh hişê wan tê serê wan, direvin derve.

Em bînin salên hê dawîtir. Gelek ji serokceşîyan îro di zemanê xwe de bav û kalên wan surgûn bûne, ketine ber şape û xezaba dewletê. Lê ne bi min û ne bi te her xizmetê jî bavkujerên xwe re dikin û nîrên xwe li xayîntiyê girêdane. Ev giş li aliyekî, lê mirov ji wan rewşenbîr, zana û siyasiyên me re ku bi pereyan eskerîyê dikin û ji Ewropa dikevin re re dikare çî beje.

Netîce: Tiradîsyon û damara hevkarîya bi dijmin re fikra neteweyîbûn û merkezbûyîna kurdan lawaz kiriye, kurd li paş-xistine û zirarên mezin dane wan. Gava Îdrîsê Bedlîsî qedera xwe da destên Sultanên Osmanî kesî bigota çima, hinek bi xurtî û bi tifaq li dijî Alay û Siwariyên Hemîdiye derketena, de ceşîtî jî bi hêsanî nehata radeya îro.

Dawî ev dikare bê gotin: Hevkarîya Îdrîsê Bedlîsî, Siwariyên Hemîdiye, cerdevanî û ceşîtî, giş xelekên zincîrekê ne. Di gişan de kêr zêde bizêkî xerab û xayin heye.



Gerînendeyê Gişti yê Radyo Umut Aydın Öztürk:

# “Mozaîka gelan ji bo me rûmet e”

**“Armanca me ew e ku, tevahiya gel û çandên li ser xaka Anatoliya û Mezopotamyayê dijîn, tevî hêlên wan ên demokratîk û insanî hembêz bikin. Li hêla din em xwe wekî “Qutîka Muzîkê” nabinîn. Pêwîst e ku Radyo Umut wekî rêxistineke medyayê, civakê li ser qewimîn û bûyerên cur bi cur agahdar bike.**

Radyo Umut, li Taksîma Beyoğlu ya Stenbolê li ser frekansa 93.4 FM. û bi slogana “Umutsuz Kalmayın (Bê-hêvî Nemînin)” weşaneke dijber anggo muxalîf dike. Di berhevoka ku danasina radyoyê dike de gotinên bi vî rengî balê dikîşînin ser xwe: “Radyo Umut, bi çavekî ku mûrdîyê red dike li jiyane mîze dike. Ew li riyêke azad ku dixwaze yekîtiyekê pêk bîne ye. Ne dengê tu rêxistin û saziyan e. Dema ku pêwîst be, Radyo Umut, mikrofoneke ku rexneyan dibarîne ye. Di xewn û xeyalên wê de dara demokrasî û azadiyê bilind dibe.” Li ser navê Radyoyê, Gerînendeyê Giştî û helbestvan Aydın Öztürk-pirsên me bersivandin.

\*\*\*

*Birêz Öztürk, ez dixwazim bi pirseke klasik dest pê bikim; navê radyoya we ji bo çi Umut (hêvî) e? Sedemeke wê ya taybet heye gelo?...*

■ Sedem gelek diyar û berbiçav e. Bi armanca û daxwaza ku guhdarên me her tim ji bo rojên pêş bi hêvî bin, navê radyoyê bûye Radyo Umut.

*Bêguman Radyo Umut bi şeweyekî muxalîf weşaneke kolektîf dike, lê dîsa jî em dixwazin der heqê xêza weşanê de hûn dîtînin xwe vebêjin.*


■ Di destpêkê de ez dixwazim bibêjim ku, Radyo Umut; dixwaze û her wiha jî hewl dide xwe ku çiqas nîrx û berjewendiyên insanî li vî welatî hene, bêne parastin, bêyî ku ji resenî û xwezahîya xwe tişteki wînda bikin. Armanca me ew e ku, tevahiya gel û çandên li ser xaka Anatoliya û Mezopotamyayê dijîn tevî hêlên wan ên demokratîk û insanî hembêz bikin. Li hêla din em xwe wekî “Qutîka Muzîkê” nabinîn. Pêwîst e ku Radyo Umut wekî rêxistineke medyayê, civakê li ser qewimîn û bûyerên cur bi cur agahdar bike. Beriya her tiştî radyoya me, xwe wezîfedar dibîne ku, muzîkeke bi kalîte pêşkêşî muzîkhezan

bike. Em her dem dibêjin platforma vê radyoyê, divê di her qada jiyane de kesên xwedî gotin, di nav xwe de bihewîne. Lewre jî, li Tirkîyeyê nivîskar û rewşenbîrên ku xwe baş dikarin ifade bikin, xwedî tewreke di cih de ne, ku xwe li hemberî qewimînan berpîrs û peywirdar dibînin. Em dixwazin di radyoyê de ji her hêlê ve rewş û rastiya gel ifade bikin. Ji ber vê yekê dema hûn li bernameyên me guhdarî bikin, hûnê bibînin ku kesên wekî Faik Bulut, Cezmi Ersöz, Arslan Başer Kafaoğlu, Cengiz Gündoğdu, Prof. Afşar Timuçin, Osman Bozkurt, Aydın Engin, Yusuf Hayaloğlu, Esat Korkmaz û Nuray İnal Özçelik ku nivîskar, helbestvan, rojnamevan, aborîzan û hiqûqzan in tenê bernameyên objektîf û rasteqîn çêdikin.

Di destpêkê de me qala dijberbûnê kir. Muxalîfbûn tenê bi gotina; “Ez ji kevneşopîyêke muxalîf tîm û wê temsîl dikim” pêk nayê. Divê insan di warê dijberiyê bîr perwerdekirin. Gelo helwesta muxalîf çi ye? Ji bo çanda muzîkê jî ev wisa ye. Divê pîrhêlî û pîrdengîyêke ku serdanpê vê coğrafyayê dorpêç bike ji me re bibe bîngê û armanca. Ji bo siyaseta jî rewş ne cihê ye. Heger em di warê siyaseta de bibêjin: “Em muxalîf in”, wê gavê divê em ji siyaseta heyî, ku derewîn e cihê bifikirin. Bi kurtahî xêza Radyo Umut; parastin û xwedîderketina li maf, daxwaz û nîrxên gelên ku li ser vî coğrafyayê dijîn e.

*Armanca we bi weşandina bernameyên pîrçandî û pîrdeng çi ne?*

■ Belê rast e! Weşanên me rasterast xitabî çandên ji hev cihê dikin. Ji ber ku coğrafyaya ku niha em li ser dijîn, bi hezaran sal bûye warê çand û gelên cihê. Bêguman em dikarin bibêjin ku her misqala vî xakê bi nîrx û hêjahiyên van çandan hatiye xemilandin. Ji ronakbîran bigirin, heta nivîskar, dîrokan, rojnameger, saziyên medyayê û hûmîmendên ku xwe li hemberî dîrokê berpîrs dibînin, kes nikare vî rastiyê bi ser guhên xwe re biavêje. Her wiha em jî nikarin xwe dûrî vî yekê bigirin. Lew-



Gerînendeyê Giştî yê Radyo Umut Aydın Öztürk

re jî em xwe mecbûr û berpîrs dibînin, ku em li tevahiya nîrxên demokratîk û pêşverû yê gelên kurd, tirk erab, ermenî, suryanî, laz gurcî, abaza, yahûdî û hwd. xwedî derkevin, biparêzin û pêşkêşî raya giştî bikin. Di vî warî de em dizanin û dibînin ku zagonên heyî her çiqas di qadên hiqûqî de astengîyan dermaxin pêşîya me jî, mixabin di warê siyasî de em bi astengîyan re rû bi rû dimînin. Dema ku em di bernameyên xwe de behsa çand û gelên cihêreng dikin, dewlet bêyî ku guhê xwe bide rêz û rêçikên hiqûqî, biryarên siyasî dide û li ber weşanên me dibe asteng. Ji bo vî yekê em dibêjin ku pêwîst e li dijî çewsandînan têkoşîn bê kirin.

*Rating a Radyo Umut di çî astê de ye?*

■ Bi qasî zanîna min ev 2 sal in ku Radyo Umut li derdora Stenbolê di nav 105 radyoyên weşanê dikin de, di rêza 10 û 15 an de diçe û tê ji vî astê jî danekekiye. Wekî mînak beriya demeke kurt ji saziyêke medyayê, dokûmentên lêkolînî ketin destê me. Li gorî vî lêkolînê em di rêza 12'an de ne, lê li gorî me ev lêkolîn, ji rastiye dûr e. Lewre em bi xwe xwe û bawer in ku em di rewşêke gelek baştir de ne. Lê ez dixwazim di vî warî de xaleke girîng bînim zimên; tevî bêderfeti û astengiyên di warê aborî û teknîkî de jî, ji ber ku em bi radyoyên ku xwediyên wan holdîng û kartel in re di pêşbaziyekê de ne tevî vî yekê jî di nav 10 radyoyan de cihê xwe digirin, li gorî min ev pêşveçûneke baş e.

*Navbera we û RTÜK'ê çawa ye?*

■ Niha kî bibêje navbera me û RTÜK'ê (ji bo radyoyên muxalîf) baş e, derewan dike. Ji avakirina wê heta îro RTÜK ji bo radyo û televizyonê bûye kelema çavan. Di nav van saziyan de her dem gengeşî û niqaş çêbûne û hê jî çêdibin. Di encama van niqaşan de, her tim dozên girtinê vedibin û radyo û TV tene girtin. Bi qasî ku ez dizanim di van 2-3 salan de ji 100'î zêdetir cezayên girtinê li van saziyan hatine birin. Radyoya me jî ji van cezayan bêpar nema. Di sala 1997'an de, Radyo Umut rojekê girtî ma. Wekî din gelek caran em hatin îkazkirin, lê xuya ye ku îro edî RTÜK ji demokrat xuya dike, li cem hinek derdoran. RTÜK'ê bi hincetên “cudaxwazî” û “sorkirina rik û nefretê” îkazên xwe arasteyî me kirin. Ji bo rojekê girtina me jî sedem ew bû ku di salvegera “Tevkujîya Gaziye” de me bernameyek li ser vî tevkujiyê çêkir.

*Gelo helwesta radyoyên bi vî rengî, ku pest û koteki li ser wan her tim heye û tene girtin li hemberî hev çawa ye.*

**Di vî warî de em dizanin çiqas di qadên hiqûqî pêşîya me jî, di warê siyasî re rû bi rû dimînin. Dema ku xwe de behsa çand û gelên cihêreng bîyî ku guh bide rê û siyasî dide û li ber wî**





## BERNAMEYÊN RAYDO UMUT

**Uçan halî (Xaliya ku difire):** Bername ji hêla lêkolîner û nivîskar Faik Bulut ve li ser qewmînên Rojhilata Navîn, îslama siyasî, çandên Rojhilata Navîn tê amadekirin. (Duşem- saet 14:00- 16:00)

**Güneşleme (Dana ber tavê):** Ji kovara Însancil gerînendeyê giştî û nivîskar Cengiz Gündoğdu û xwedî û berpirsê karê nivîsaran nivîskar-helbestvan Berrin Taş li ser politîka, hiqûq, çand, jin û hwd. (Du-

şem saet 21:15-23:00)

**Kaşık Düşmanı (Neyarê kefçiyar):** Av. Ayşegül Kaya li ser pirsgirêkên jinan, li ser jinan dîtin û ramanên mêran, bi tevî telefonên guhdaran. (Şêşem 16:30-18:00)

**Yürek Sapağı (Taldeya dil):** Helbestvan- nivîskar her wiha Gerînendeyê Weşana Raydo Umû'ê Aydın Öztürk di bernamêyê de li ser jiyana rojane disekine. (Şêşem saet 21:15-23:00)

**Ekonomi Gündemi (Rojeva aboriyê):** Aborîzan, nivîskar û rojnamevan Aslan Başer Kafaoglu li ser ekonomiyê pirsên guhdaran dibersivîne. (Çarşem saet 14:00-16:00)

**İçimizden Biri (Yek ji nav me):** Helbestvan- nivîskar û rojnamevan Cezmî Ersöz li ser aliyên cihêreng yê jiyana mirovan analîzên balkêş dike. (Çarşem saet 21:15-23:00)

**Felsefenin Prizması (Prîzmaya felsefeyê):** Prof. Afşar Timuçin ku li zanîngehên Marmarâ, Mimar Sinan û Stenbolê dersan dide, di vê bernamêyê de li ser mijarên felsefî radiweste. (Pêncşem saet

14:00-16:00)

**Sanatın Sıcak Sesi (Dengê germ ê hunerê):** Aydın Öztürk li ser muzîk, sînema, tiyatro û hwd. mêvanan di bernamêyê xwe de diezmîne û pirsên guhdaran dibersivîne (Pêncşem saet: 21:15-23:00)

**Söz Hakkı (Mafê gotinê):** Berpirsê Nûçeyan ê Radyo Umûtê Cengiz Yıldırım mijarê girîng ji hefteyê tevî mêvanên xwe ji nîqaşê re vedike.

(Înê saet li 14:00-16:00)

**Nağmelerin Dilinden (Ji zimanê awazan):** Ferda û Engin Tari ku li muzîkxaneyên cur bi cur xebatên xwe didomînin, li ser 'Sanat Müziği' radiwestin (Înê saet: 20:00-21:00)

**Sağlık Penceresi (Şibaka tendirustiyê):** Dr. Hüseyin Güntaş li ser nexweşiyên û problemên tendirustiyê pirsên beşdarên bi telefonan dibersivîne (Şemî saet di 15:00-16:00)

**Emeğin Dünyası (Cihana kedê):** Mûşawirê malî, helbestvan û nivîskar Osman Bozkurt, li ser tîgînên kedê, rêxistinbûn û radiweste. (Şemî saet 16:30-18:00)

**Aykırı (Awarte):** Bername ji hêla nivîs-

karê Rojnameya Cumhuriyetê Aydın Engin ve 15 rojan carekê roja duşeman saet li dora 16:15-18:00'an tê pêşkêşkirin.

**Yusuf Hayaloğlu ile (Bi Yusuf Hayaloğlu re):** Helbestvan Yusuf Hayaloğlu bi mijarên li ser helbest, jiyana mirovan derdikeve pêşberî guhdaran.

(Şemî saet 22:00- 24:00)

**Ağustos Çocuk Programı ( Bernamêyê gelawêjê ya zarokan):** Şanoger û nivîskar Nuray İnal Özçelik li ser zarokan her roja yekşemê saet 10:00-11:30'an de bernamêyê xwe pêşkêş dike.

**İşığa Muhabbet (Digel ronahiyê dembuhêrk):** Lêkolîner û nivîskar Esat Korkmaz li ser çandên Anatoliyayê û çandên serhildêr bernamêyê amade dike (Yekşem saet (14:00-16:00)

**Radyo Tiyatrosu (Şanoya Radyoyê):** Şanogerên 'Tiyatro Mangayê' li ser şanoya radyoyê roja yekşemê saet li dora 17:00-18:00'an di bernamêyê de bi listikên xwe derdikevin pêşberî guhdaran.

**Mesela Radyo Karacadağ li Rihayê 30 rojî hate girtin, bi sedema ku di bernamêyên xwe de cih dide muzîka kurdî û reaksiyonên ji bo ihlâlên mafên mirovan. Ango peywendiyên radyoyên dijber çawa ne, divê çawa bin?**

■ Bi rastî, ev xaleke girîng e. Bêguman radyoyên ku bi heman çavî li bûyeran mêtê dikin, di rêç û şopa nixêrî hepar û bi rûmet de dimeşin, divê yekîtiyê xurt û watedar di nav xwe de saz bikin. Di vî warî de 2 sazî hene; yek ji wan "Televizyoncular ve Radyocular Birliği" (Yekîtiya Televizyonvan û Radyovanan) bi kurtasî ev sazî wekî "TÜRTEB" tê naskirin. Ev rêxistin zêde bi ser sîstemê de naçe. Rêxistina din bêhtir xwe nêzikî radyoyên çepgir, demokrat û şoreşger dibîne û dixwaze di nav radyoyên çepgir de yekîtiyê ava bike. Lê mixabin ev sazîyên navborî di warê yekîtibûnê de qels û lawaz xuya dikin. Wekî ku te jî got li Rihayê Karacadağ, li Mêrsinê Şok û li İzmirê jî Radyo Demokrat tene girtin, ev sazî yekser ranabin û li hemberî van çewsandinan reaksiyonê nîşan nadin. Ev kêmasî ne.

**Di bernamêyên xwe de hûn çiqas cih didin muzîka kurdî û muzîkên gelên din yê Mezopotamya û Anatoliyayê?**

■ Niha tiştêkî balkêş û mîzahî heye li Tirkîyeyê; di zagona bingehîn (Ana-

yasa) de nabêje ku ku kurdî qedexe ye. Ev xal di sala 1983'an de hatiye hilandin. Rast e! Beriya 1983'an kurdî hatibû qedexekirin. Îro gelêk hûnermend kasetên xwe yê kurdî dibin 'Wezaretê Çandê' û bandrolê distînin. Ne di warê weşanê de, lê di warê çend hevokên politîk de astengiyan derdixin û dibêjin bila kurdî be, lê ne politîk be.

Îro li vî welaî bi tenê ji bo ku xêzekê siyasî dihebin, propagandaya xêzekê an kesekî kiriye, gelek radyo hatine girtin. Çevre Radyo yek ji wan bû. Wekî din em zêdebûna çand û gelan li ser vî erdnîgariyê wekî dewlemendiyê dibînin. Mozaîka gelan her çiqas ji bo hin derdoran wekî xewnerêşk be jî em vê yekê wekî pir-rengiyeke bi rûmet dibînin û dinirxînin. Lewma jî wekî me di serî de jî gotibû em di bernamêyên xwe de cih didin muzîkên bi zimanên tirkî, ermenî, zazakî, soranî, kurmançî, azerî, suryanî, îbranî, erebî û hwd.

**Hûn cih didine muzîka kurdî ev diyar e. Lê wekî rexne tê gotin ku Raydo Umût qet cih nade gotin û kilamên dengbêjan.**

■ Belê rast e. Ev kêmasiyeke û haya me jî ji vê yekê heye. Rola dengbêjan di muzîk û zargotina kurdî de gelekî girîng e. Dengbêj di literatûra muzîka kurdî de hêmana bingehîn e û wekî pîrekê ye di navbera muzîka modern û ya klasîk de. Li hêla din jî ber ku edebiyata kurdî ji layê nivîskî ve qels e barekî giran ketiye ser milên dengbêjan. Çima em cih nadin dengbêjan. Sede-



Li Stenbolê dengêkî dijber: Radyo Umût, 94.3 FM

ma mezin kêmbûna arşiveke wisa ye. Tiştêkî din jî ev e, dema hûn ji dengbêjan kilamêkê bidin guhdarîkirin, hûn ancax dikarin beşek ji kilama wî biweşînin, ji ber ku hinek kilam hene ku saetekê, du saet bêne gotin xilas nabin. Tu tev nikaribî biweşîni û tu beşek jê biweşîni ev jî ji bo keda dengbêj li gorî min bêhurmetî ye. Li hêla din, bi beşekê tenê tevahiya kilamê jî nayê fêmkirin. Lê dema em dengbêjan di arşivên xwe de bibînin, bi dilşahî em dê wan derxin pêşberî guhdarên xwe.

**Birêz Öztürk em werin ser profîla guhdarên Stenbolê. Dema hûn guhdarên radyoyan beş bi beş bikin, dîmeneke çawa derdikeve holê?**

■ Niha bê mûbalaxa em dikarin bibêjin ku li Stenbolê du cure guhdar hene; yek, kesên ku haya wan ji bûyer û qewmînên rojane tune ye, karê wan kêf û henek e, serê xwe bi tu tiştî re neşî-

nin, bi devoka amerîkî (amerîkan aksanî) diaxivin, arabeskhez in, tolaz in... Kesên wisa li radyoyên wekî me guhdariyê nakin.

Beşa duyemîn berevajî van kesan in. Serê xwe bi bûyeran re diêşînin, aliyên wan ên însanî, demokrat xurt in. Navbera wan bi medya û dezgehên ragihandinê re baş e. Guhdarên me bi piranî ji nav vê beşê pêk tên...

**Wekî dawî tiştêkî hûn li gotina xwe zêde bikin...**

■ Wekî gotina dawî, ez dixwazim bibêjim ku Radyo Umût; dişibe fenera behrê. Ev fener, ji bo keştiyêke ku noqî avê dibe çiqas xweşik û girîng be, Radyo Umût jî ji bo tîkiliya di nav guhdaran de ew qas girîng. Tim û tim ronahiyê dide derdora xwe û li dijî tarîtiyê bî înat her dem dibiriqe.



# Pênûs avis e, kaxiz tî ye

Gelê kurd êdî ji sînoren sloganê derbas bûye. Çima em nivîskar ji van sînoran derbas nabin? Wekî tê zanîn, têkoşîna rizgariyê hebûna gelê kurd, bi dinyayê daye pejirandin. Gerîla rista xwe leyîst û hê jî dileyize. Vê têkoşînê dergehê wêjeyê li ber me vekir û singa wêjeyê li ber lingê me raxistiye êdî.

**E**z ji ku de dest pê bikim, nizanîm. Pênûs avis e, kaxiz ev sê hezar saf e ku wekî dilê me tî ye, lê dem jî bêxwedî û serberedayî ye û ji xwe kêman caran em rûyê wê dibînin. Di wan kêlikên ku em rûyê wê dibînin jî an destê me bi hevîr e an em xercê tev didin an jî xewê xwe li bedenê me yî westiyayî pêçaye. Niha dema çiroka cihanê tê zimên, pêşî çiroknivîsên mîna Steinbeck, Çexof, Jack London, Sadella Venus û hwd tene hişê mirov. Van çiroknivîsan êş, kul, xem, şadî û jiyana gelên xwe ji çirokên xwe re kirine mijar û di qada wêjeya cihanê de hilkişandine asteke bilind. Erê, niha di vir de ji bo çiroknivîsên kurd jî ev divêti xwe dide der. Gelo em çiroknivîsên kurd, çiqasî bi îdîa ne û em dikarin çirokên kurdî yî nûjen, ji rastiya civaka xwe biafirînin û di qada çiroka cihanê de hilkişînin asteke bi rûmet.

Li gorî min, karê wêjeyî û hunerî, ne evçendî hêsan e. Di berhemêke hunerî de, divê estetîkeke dewlemend û hêmayên (îmge) xurt hebin. Gelo mirov dikare berhemêke bê-estetîk an jî berhemêke hêma tê de bi kar nehatî bifikirê? Mixabin wekî di jiyana de jî rastî xwe dide nîşan, bersiv naye dayîn. Lewre em dibînin berhemêke hunerî ya bê-estetîk, ling seqet e. Dîsa berhemêke bêhêma bêdest e. Ger em çend navan ji nava rêza çiroknivîsên kurd derxin, emê bibînin ku çiroka kurdî, di rewşeke dijwar de ye. Pêwîst e çiroknivîsên kurd, xwe ji nava dev û diranê vê cercereyê rizgar bikin û li deriyên nû bixin. Armanca min ne ev e ku ez bêjim, bila serpehatî û hwd neyê nivîsîn. Na! Li dijî vê yekê, her qehremaniyeke li Kurdistanê pêk tê, divê derbasî ser kaxizê bibe. Her serboriyek, her zordariyek, ku li Kurdistanê pêk tê, divê bê nivîsîn. Lê bi bawerîya min, serboriyek, li Kurdistanê pêk tê, divê derbasî ser kaxizê bibe. Her serboriyek, her zordariyek, li Kurdistanê pêk tê, divê bêne-nivîsin. Lê li gorî dîtina min, serboriyek an jî bîranînek nabe çirok. Lewre navê wan li ser e. Gelo bi dubarekirina rastiyê (çi bûyer, çi diyarde) em dikarin xwe wekî çiroknivîs bi nav bikin? Ez nabêjim bila çirok neyê nivîsin, lê ez dibêjim, divê her çiroknivîs xwe hilweşîne, kirasê kevneşopiyê biqetîne û xwe li ser pirtûkên gewdê xwe, bi hostayî, wekî hunermendekî jîr, ji nû ve biafirîne. "Lewre hunermendekî/ê ku xwe ji nû ve neafirîne, li gorî min, wê tu car nîkaribe berhemêke hunerî jî biafirîne." Ev zagoneke huner û hunermendiyê ye. Dubarekirin, ne ji nû ve afirandine, wênekirina rastiya bûyeran e. Em wêneyê kesekî/ê heke hildin dest, emê bibînin ku, wêne qopyaya wî/wê bixwe ye û ne tiştekî din. Mirov nikare ji wêneyê kesekî/ê bibêje ji nû ve afirandina wî kesî/ê ye. Dema mirov li wêne bimeyîze, tenê ew xwediyê wêne, wê di mêjî yê mirov de nîgar bibe. Ji derveyî qopya xwediyê wêne, tu tiştekî nû di wêne de nayê dîtîn. Rista wêne bi bîranîne û ne tiştekî din e. Lê huner ne wiha ye. Dema şehîdketina gerilayê-

kî bibe mijar ji çirokeke nûjen re, ew gerîla, divê ji nû ve, di dinya çirokê de bê vejandin û divê çirok bibe mîsogerîya nemirîya wî/wê. Pêwîst e di çirokê de hêma bîn bikaranîn û estetîkeke hunerî li ser bejna çirokê, şalê xwe raxe. Ji bo em ji hêla estetîkê bibin xwedî ramanên dorfireh û dewlemend, divê em li ser estetîkê lêkolînan bikin. Li deriyê pêvajoyên dijwar bixin. Azîneya hêma bikaranînê hîn bibin. Estetîk çi ye? Di berhemên hunerî de rista wan çi ye? Heke em der barê van herdû bêjeyan de nebin xwedî agahiyên dorfireh, gelo emê çawa çiroka nûjen biafirînin? Ma gengaz e ev yek? Heke tenê armanca me

çar caran xwendiyê? Heke çirokek bi qasî em wê sisê an jî çar caran bixwînin, bi me şerîr nebe, sedem çi ye, em tucar ji xwe dipirsîn gelo? Bo nimûne:

Helîm Yusiv di pirtûka xwe ya "Mîrî Ranazîn" de, çiroka xwe ya "Ava Şîn" li ser şehadeta gerilayekî ristiye. Lê wî di çirokê de hem hêma pir bi kar anîne û hem estetîkeke hunerî daye çirokê: "Fesih li tîvinga xwe û li ruwê avê dinêrî. Baran xurt bû, hevalên wî yeko yeko xwestin xwe li avê xî û derbas bibin aliyê din. Lê esmanê reş û qelişî, zor da zîpik û bahoz û baranê. Xuşîn bi avê ket. Bû guje guja pêlan, lehî rabû. Ji ber ku Fesih pir ji avê hez di-

Xwendina wê çêjekê dide mirov. Carekê mirov bi xwendina wê tîr nabe. Hêza wê ya bîngêhî jî ji xwe di vir de ye. Çiqas dem di ser xwendina çirokê re bibihure jî çirok nayê jîbîrkirin. Lewre çirok ji layê estetîkê û hêmayan ve xurt e. Mirov dêhna xwe dide çirokê, dibîne ku nivîskar ji derbirinên rojane bi dîr reviyaye û di çirokê de honandineke xurt pêk aniyê.

Bavê Nazê, di pirtûka xwe ya bi navê "Govenda li ber mirinê", di çiroka "Cihana firax şuştinê" de wiha nivîsandiye: "Bi xwe, ez ji wan bûm ên ku firax şuştin ji bo zilaman eyb didît. Ma bi rastî jî, kê ev tişt li ser xwe qebûl dikir? Ne tenê zilam vî karî hinkûfê xwe nabînin, heya pîrek bi xwe jî, vê kêmasiyê naynin ser xwe. Heger wiha biba û bidîta xwediyê malê ketiye nava firaxan, dê wê ji şerman derî li pey xwe bigirta û dê nehiştta ku çavên wê li yên wî biketa. Paşê, di nava pîrekan de, bi kurte pistî de bigota: Welê, werin vê ecêbê, min destê cîranê me di firaxan de dît! Por kurno! Wî bi xwe firax dişuştin!" Pîrekên li dorê, dê bi awayekî hê matmayîtîr bigotana: "Peptûk rebenê!"

Çirok, bi zîmanekî gelekî hêsan û şayik hatiye nivîsîn û herikbar e. Nivîskar, di vî çirokê de derûniya jina kurd dahûrandiyê û ew ramanên di binhiştina wê de bi cih bûne li ber çavan raxistiye.

Bi qasî ku ez dizanim, ji bo hunermend, di afirandina berhemên hunerî de, tu sînor û çarçowe tune ne. Di cihana hunermendiyê de, ji bo kesê hunermend, derfetên bêdawî hene. Çiqas hunermend, hewl bide, tîbikoşe, wê ewqas jî di qada hunermendiyê de bi pêşve. Her ku biafirîne, ew qas merc û derfet ji bo afirandina berhemên nû peyda dibin.

Heta ku di çiroka kurdî de em di şûna gerilayekî/ê du gulek, di şûna gundekî şewitî de porên jîneke şewitî, di şûna çekan de dilê zarokê/ê ku hildiyaye bikar neyînin, li gorî dîtina min, wê tucar çiroka me nîkaribe rabe ser lingan û ber bi nûjeniyê ve bi-beze. Rast e! Do pêdivî bi sloganan hebû, lê îro gelek rabûye ser lingan û ji vî gellî re wêje û huner divê. Gelê kurd êdî ji sînoren sloganê derbas bûye. Çima em nivîskar ji sînoran derbas nabin? Wekî tê zanîn, têkoşîna rizgariyê hebûna gelê kurd, bi dinyayê daye pejirandin. Gerîla rista xwe leyîst û hê jî dileyize. Vê têkoşînê dergehê wêjeyê li ber me vekir û singa wêjeyê li ber lingê me raxistiye êdî. Tenê hewleke bi wêrekî divê. Digel van derfetên hêja, em rabin dubarekirina kirînen gerîla ji xwêre bikin kar, ne xelêtî ye gelo? Divê çî çiroknivîs û çî kesên bi wêje û hunerê re eleqedar, hay ji vatîniya xwe ya dîrokî hebin. Kirasên kevin nema li bejna çirokên me tînin. Divê em li kirasên nû bigerin ji bo çirokên xwe, ku em bikaribin çiroka xwe bi lezgîniya biajon, ber bi warê wêjeya dinyê, ya nûjen ve.

HEMDILA BAQI



Helîm Yusiv di pirtûka xwe ya "Mîrî Ranazîn" de, çiroka xwe ya "Ava Şîn" li ser şehadeta gerilayekî ristiye.

dîlketina

di nava rûpelên rojnameyê an jî kovarekê de be, îcar emê çawa çiroka kurdî di qada navneteweyî de bigihîjînin qonaxeke berz û bilind? Ma hê dem nehatiye, ku em van cilên kevînar, ji ser bedena çiroka xwe biavêjin, bikin piçîk û parî?

Heta îro bi sedan çirok hatin weşandin di rojname û kovaran de. Gelo çend ji wan di mêjîyê me de mane? Ku nemane, divê em ji xwe nepirsîn gelo, çima di mêjîyê me de nemane? Gelo me kê çirokek sisê an jî

kir û ji ber ku kêfa avê jî pir jê re hat, avê rahêjt laşê wî tevli tîvingê û ew ji xwe re bir. Laşê wî bû hevalê pêlan. Pêlên din, pêlên bêserî. Pêlên kesk, sor, pêlên zer. Laşê Fesih yê li hevhatî, bi pêlan re dîr bû, fireh bû, bilind bû, bilind bû gihîşt zîkê esmên. Laşê Fesih bû çiya. Çiyayekî din li çiyayên Kurdistanê zêde bû."

Dem a mirov vî çirokê dixwîne, mirov dibîne, ku bêhna nûjeniyê ji wê difûre. Ji nû ve vejandina Fesih heye di çirokê de.



Li Navenda Çanda Mezopotamya Şaxa Stenbolê

● 07.02.1998 Şemî: Konsera Koma Rewşen, saet:14.00

Nîşandana dîayê: "Gökyüzünün Kirpiğinden Güllümsüyen Kardelen (Lîloza ku li Ser Birüyên Ezmên Bibişire)" Seher Yıldız: Pêşkêş: Şair Mehmet Özer

● 08.02.1998 Yekşem: Konsera Koma Gulên Xerzan, saet: 14.00 Şano: Komara Dînan Şermola, saet:17.30

● 11.02.1998 Çarşem: Panel: Li Kurdistanê Domana Perwerdehiyê Zimanzan F.Huseyin Sağnîç Hêvojkar: Mustafa Avcı Aborizan: Ahmet Kaya, saet:18:00

## ÇALAKIYÊN HEFTEYÎ



Li NÇM'ya İzmirê

● 07.02.1998 Şemî: Şano: Govenda Hilo, saet:14:00

● 09.02.1998 Duşem:

Panel: Geleşeyên Şanoya Kurdî

Beşdar: Şanoya Hêvî, Teatra Jiyana Nû, Teatra Evîna Welat, Teatra Yekbûn Li MEDKOM'ê

● 07.02.1998 Şemî: Gotûbêj: Li ser romana Mehmet Uzun a nû; 'Ronî Mîna Evîne, Tarî Mîna Mirîne.', beşdar: Mehmet Uzun, Mazhar Kara, Yakup Karademir, saet:17.00

# Panela Salvegera Azadiya Welat

"Şoreş li ku be divê em jî li wir bin. Hêviya me ev bû ku me li welat rojnamegerî bikira. Lê îroj li welat gelek xwendevanên me wekî xebatkarên rojnameyê dixebetin û nivîsan jî me re dişînin. Her wiha em xwe tu car bi Bakur jî sînor nakin."

Li Navenda Çanda Mezopotamya Şaxa Stenbolê roja 5'ê reşemîya 1998'an xebatkarên Azadiya Welat ji ber "Duyemîn Salvegera Weşandina Azadiya Welat" bi navê "Rojnamegeriya Kurdî" panelek li darxistin. Ji bo bernamê Gerîndeye Giştî yê Azadiya Welat Samî Tan, Berpîrsê Karên Nivîsaran M. Salih Taşkesen û xebatkarên rojnameyê Mazlum Doğan û Roşan Lezgîn wekî beşdar amade bûn.

Di destpêka bernamê de Samî Tan, bi giştî li ser rojnameya Welat, Welatê Me û Azadiya Welat sekinî. Tan diyar kir ku rojnameya Welat 115 hejmar, Welatê Me 46 hejmar û îroj Azadiya Welat jî amadehiya hejmara 106'an dike. Tan di berdewama axaftina xwe de wiha got: Rojnameya Welat dest diavêt hemû mijaran. Ji ber wê egerê ne wek rewşa îro ku Azadiya Welat tê de bû.

Îroj MED-TV

heye,  
K o -  
v a r a  
Jiyana  
Rewşen  
h e y e .  
Rojname-  
ya Azadi-  
ya Welat

gelek mijarên cur bi cur di hundirê xwe de dihevin. Ji ber vê yekê ez dikarim rojnameya Azadiya Welat di cihanê de di vî wari de tekarin rojname ye"

Tan, rewşa berê û ya îro ya nivîskar û xwendevanên Azadiya Welat dan ber hev û wiha axivî: "Berê me qadroyên xwe bi ewrûpa re girê didan. Îroj ne wisa ye. Şoreş li ku be divê em jî li wir bin. Hêviya me ew bû ku me li welat rojnamegerî bikira. Lê îroj li welat gelek xwendevanên me wekî xebatkarên rojnameyê dixebetin û nivîsan jî me re dişînin herwiha em xwe tu car bi Bakur jî sînor nakin. Başur jî her dem di rojeva me de ye. Lê mixabin jî ber egerên teknîkî û hwd... em başbaş nagihêjin armanca xwe."

Piştî axaftina Samî Tan, xebatkarê Azadiya Welat Mazlum Doğan li ser psikolojiya miro-

vên ku bi kurdî naaxivin rawestiya û sedemên vê yekê diyar kirin. Doğan, di dîmahîka axaftina xwe de wisa peyivî: "Îroj nêzîktêdayinek çewt heye di civaka kurd de. Ên ku bi kurdî diaxivin, wekî "gundî û nezan" lê yên ku bi tirkî diaxivin wekî 'ronakbîr û bajarî, tîn binavkirin' Doğan wekî mînak jî malbatên dibêjin 'Zarokên me diçin dibîstana tirkan ji ber vê yekê em bi wan re kurdî naaxivin.' da. Piştî re da zanîn ku kesên wisa dibêjin li welatên Ewropî jî bi zarokên xwe re kurdî naaxivin, dîsa bi tirkî diaxivin.

Piştî van ramanan Doğan ji bo diwaroşa zimanê kurdî hêvîdariya xwe anî zimên û got ku dawî ya dawî

b i c i h -  
b û n a  
z i m a -  
n î ê  
k u r -  
d î  
g i -  
r ê -

dayî dewletbû-

ne ye lê tiştên ku divê îro

bên kirin kurd pêk naynin.

Berpîrsê Karên Nivîsaran M. Salih Taşkesen jî li ser rewşa rojnamegeriya Çukurovayê rawestiya û zilm û zordariya Tirkîyeyê a li ser rojnameyên Azadiya Welat - Welatê Me û belavkarên wê vegot. Taşkesen da xuyakirin ku Tirkîye ji kesên ji welatê xwe koçberbûne û hatine Tirkîyeyê dixwaze, ew jî ziman, çand û ji dîroka xwe jî dûr bikevin. Lê dîsa jî gelê kurd ev planên dijmin vala derxistine.

Piştî axaftina Taşkesen, nivîskar û nûçegihanê Azadiya Welat Roşan Lezgîn li ser têkiliya gel û çapemeniyê sekinî. Lezgîn kesên ku ji çapemeniya xwe dûr disekin şiband kesên ker û lal û got ku divê xortên ku radîhêjin çekan, bikaribin pirtûkekê bi kurdî jî bixwînin.

Di berdewama axaftina xwe de Lezgîn da zanîn ku her çiqas di hêla siyasî de kurd serketine jî divê di qada zimên û hunerî de jî ev serkeftin çêbibe. Panel bi pîrs û bersivên beşdaran qediya.

ŞÊXMUS ÖNAL

## TÎŞK

### Qirkerdena Dêrsimî



LERZAN JANDÎL

Bê guman şarê ma heverê polîtîkaya Osmaniyan serranê 1800 ra nat şer kerdo. Nê sarewedayên gaganê bê bine(aralîksîz) her hetê welatî de, gaganê jî ebi bine û tenê hetanê welatî de biye.

Nê hetanê welatî ra yew ca jî Dêrsim o. Dêrsim de serra 1983 re nat hemverê kolodariya Osmaniyan sarewedayene qij û girsî amê viraştene. La belê nê sarewedayên tim, hama hama tim teyna mendê. Verê vatena xo, sebetake na tayina rind bêro zanayene çend mîsalan bidêrime:

1907 de aşîrê Koçan û Kureşan teyna mendê, kesî hetê dîne nêkerdo. 1909 de aşîra Heydaran, 1914 aşîra Kiran, 1916 da aşîra Ferhanan teyna mendê. 1920 û 1921 de aşîrê Koçgîrî, wunciya 1926 de aşîra Koçan, 1930 aşîrê Pelemoriye teyna mendê.

Nê teyna Dêrsim de biye. Heta welatê bînî de; cêr Şêx Mahmut Berzencî, rojhilat de Simko, Şêx Seîd, Ararat, Zilan û ê şarewedayene qij û girsê bînî.

Yanê nê teyna dêrsim de, la belê her hetê welatê ma de eke yew aşîre hemverê dişmenî veciya, ê bînî ya bê het! mendê, yan jî hetê koledaran gureto. Na wertê aşîranê ke mordemê yewbînan biyê de jî nîyanên biya.

Koçgîrî sare dane we, Dêrsim verdê katîf hete Koçgîriye nêkeno û bodo jî herê maneno. Koçanî sare danê we, ê bînî bêveng manenê. Şêx Mahmet ceng keno, hetê bînî hewn de rê. Şêx Seîd hetê ra seba mafê şarê ma dano pêro, heto bîn ra şarê ma hemverê leşkeranê de vecîno.

Nêçîyan niya pardoksî dîroka ma de zaf ê. Nê çî jî hetê tenê kesanê manê zanyan! ra çewt amê fam kerdene. Persênê: qey fêlankesî şer kerd, la belê ê bînan hetê de nêkerd. Na xayîntî ya. Na welatpareziye niya. Ê rind keso ke, aşîra ke ewro sare dardo we meştê şono/ şana lewe dişmenî. Na senê welatparezî ya? Kriterê naye çik ê? Ganî verde nê zelal bê, ke bado jî mordem bişikiyo na derheq de ebi serê de zelal cewabê dînan bidêro.

Angorê birûbawariya min, zer her çî, na çî de jî zaf lerze êna kerdene. Çiyê ke mordem ganî pêniye de vaco, m avirêndiye de vanîme. Na jî bêguman nêweşîyanê neweyan, bêrehetîya neweyan kena wertê şarê ma.

Ganî ma bipersime, qey o dem de şarê ma, aşîrê ma, yan jî dîne ma niyamêne têelewe. Qey ewro ênê têelewe? Eke ma cewabê na persê raş biderimê, cewabê persanê bînan jî raşt danîme. U naye ra tepiya jî nêvanîme fêlan ke, fêlan aşîrê, fêlan...xayîn bî, fêlan...xayîn nêbî yan jî welatparez bi.

Se ke cor jî amê vatene, Dêrsim; yanê perotiya Dêrsimî tim herê mende, tim teng mende, tim pêrotiya dişmenî nêdiye. Kledaran ebi taktîkanê nazîyan aşîrê Dêrsimî(her çîqa xususiyetê xo bibê jî naca şarê mordem çîno) roj bi roje, serre be serre qewete ra, taqae ra fiştî. Xlaka dormeyê Dêrsimî kerde teng. Êndî ke s nêmend bî ke hetkariya Dêrsimî bikero. dêrsim zerrê xelaka tengede teyna mendî bî.

Rojê de henêne ame ke, qeweta Dêrsimîya ke est biye jî seba sarewedayene de xurte nêvet.

A roje jî roja destkerdena qirkendena(jenosîde) şarê manê Dêrsimî ya. Yanê 2ê aşma Çeleyî 1938 î. Naye ra tam 60 serre ver.



# Destana Salihê Naso û Kejê (1)

**S**alihê Naso Silfî ye. Ji malekê xanedan e. Torinê Evdîn Paşa yê Gurgîn e. Wî navûdengiya xweşikbûn û bedewbûna Kejê ya keça Terhan Axa bihîstiye. Jê re gelek meraq çêbûye ku hela, Kejê yeka çawa ye gelo?

Rojekê xwe girê dide û berê xwe dide mala Terhan Axa.

– Selamûn eleykûm.

– Eleykûm selam.

Li qonaxa Terhan Axa jê dipirsin:

– Xortê delal, tu ji ku yî? Çi digerî? Salo dibêje:

– Ez ji xwe re li kar digerim.

Bala xwe didinê; bi rastî jî xortekî nazik û şimşaq e. Qet naşibe karkeşan. Peyê kar nîn e. Jê dipirsin:

– Tu şivanî karî bikî? Dibêje:

– Na. Dibêjin:

– Gavanî karî bikî? Dibêje:

Naxêr. Dibêjin:

– Rencberî, cot, mot... Salo dibêje:

– Wellehî ez wan jî nikarim bikim.

– Êêêê....

Lê, çavên Salo lê ye ku li nav malê karekî bidinê û ew jî karibe bi hêsanî Kejê bibîne, gelo ka yeka çawa ye? Jê pirsin:

– Lê tu dikarî çî karî bikî?

Salo berê xwe dide Terhan Axa û dibêje:

– Axayê min. Hema ezê li nav malê xizmeta mêvanên te bikim. Ezê ji wan re çay û qehwê bikêfînim.

Terhan Axa dibêje:

– De ka hela rabe qehweyekê çêke em bibînin. Hele tu dizanî çêkî, an na?

Salo, rabû qehweyek keland, hantîkî Terhan Axa kir. Êde, Salo mirovekî xanedan e. Timî xwedî mêvanan bûye. Ev yek di tilî û pêçiyên wî de xuya ye. Terhan Axa tama qehweya wî pir dicibîne. Û dibêje:

– Baş e. Hema li nav malê ji mêvanên min re çay û qehweyekê tenî bikelîne û xizmeta mêvanên min bike bes e. Tiştêkî din ji te naxwazim.

Terhan Axa, ji ber xizmeta Salo ya qenc gelek kêfxweş dibû. Salo salekê salewext jê re xizmet kir. Xulamî û navmalî kir. Lê, hîna çavên wî bi Kejê ne ketibûn. Salo, êdî li berxwe neda û rojekê bi şeveqa sibê re xwest, hesreta dîtina Kejê ji dilê xwe derxe. Salo, xwe di alî malê de qeliband û kete oda Keja gulîsor. Ku Kejê jî li ser limêja sibê ye. Çavên Salo û Kejê bi hev ketin. Bi awirên çavan li hev mat man. Devê herduyan jî bi hev re vekirî man. Tîra eşqê li herduyan jî ket û birîneke kûr di dilê wan de

vekir. Wekî Leyla û Mecnûn şewq dane hev. Ne Kejê pirsî ku ew kî ye û ne jî Salo deng kir.

Salo, zivirî derbasî alî mêvanan bû. Lê, êdî Salo, ne Salo yê berê ye. Damarên qîştî wî qetiyane. Şûşeka dilê wî hatiye şikestin. Ji alî din, Kejê jî bi eynî rengî ye, rewşa wê jî ya Salo ne çêtir e. Tîra eşqê di wê de jî kar kiriye.

Salo, sê salan li mala Ferhan Axa xizmet kir. Lê ne rojek ji nava rojan Salo got dilê min li Kejê heye û ne jî Kejê got dilê min ketiye Salo. A wer di halê xwe de man.

Li wî navê, lawê mîrê Palo hat Kejê

min?

Salo zivirî jê re got:

– Axa, ne ku navê te tenê axa ye. Welle, ez ji te axatir im. Mêvanên min ji te zêdetir in. Ez vaye serê sê salan e ji te re xulamtiyê dikim. Ma te rojek ji nav rojan negot; Tu kî yî, lawê kê yî û tu çî digerî? Te rojek ji nav rojan ne got ku lawo, derdekî te heye an na? Te her tim dixwar û vedixwar, tu li ser piştê radiza. Te qet tê demexist ku derdekî min heye?

Ferhan Axa got:

– Lawo Salo, ma derdê te çî bû? Gelo, derdê te Kejê bû? Lawo ma te bi gota minê Kejê ji te re bikira qurban. Ma tu

Kejê re got:

– Ev xortê han bû çend caran li ber derê me re dere û tê. Min ev xortê han tu car li welatê me nedîtiye. Nizanim ev kî ye?

Wê demê Kejê dibêje:

– Ev xortê han, xulamê mala bavê min bû. Sê salan ji mala bavê min re xulamî kiriye. Êdî wer xortekî maqul e, cindî ye, bi namûs e. Êde wer însanekî baş e, qenc e. Mirovekî ewa çê ne hatiye dinê?

De Kejê got û got... Yek lê kir hezar. Ewê demê mîrê Kejê got:

Madem tu hewqas salixên wî dikî, hema bila were seyîsiya hespê min bike.

Lawê mîrê Palo gazî Salo kir got:

– Xortê delal, kerem ke were jor. Salo, derket jor. “selaykûm eleykûm.”

– “Eleykûm selam.” Mîrê Kejê got:

– Xorto, xanima min gelekî salixên te da. Ez dixwazim tu seyîsiya hespê min bikî.

Salo ku tîra eşqê lê ketiye, çî karî bide wê bike. Salo, got:

– Ser çavan. Bila be mîrê. Ezê seyîsiya hespa te bikim.

Salo, saleke salewext, ji lawê mîrê Palo re seyîsî kir. Lê ne rojek ji nava rojan Salo ji Kejê re got: Salo, cardin rojek ji rojan di wexta limêja sibê de li alî oda Kejê qeliband. Ku, Kejê wa ye limêja sibê kiriye û destên xwe ji xwedê re vekirine. Jor de hêstirên çavên wî tîn xwarê. A wer sekiniye. Wê demê tehemmûl di Salo de namîne û deng li Kejê dike, dibêje:

*Lê zeriye, lê zeriye, lê zeriye, lê zeriye*

*Lê Zeriye sibehê tu sekiniyî li ser limêje*

*Te destên xwe li ber rebê alemê, xalîqê*

*meqsed û mirazan*

*Te stûyê xwe xwar kiriye ji ber eşqa dilê rezil*

*Ez nizanim tu duayan dikî an nifiran*

*dibarînî*

*Malxerabê, ez nizanim vê sibehê tu çî dibêji*

*Te Salihê Naso kiriye dîn û heşaşê çem û bajarê Palo*

*Malxerabê te wî kiriye xulam û seyîsê hespan*

*Ê de vaye, ev çend salên min in qediyar ez ji aqil bûme*

*Ji ber evîn û sevdâyê te, ez kirime kerr û gêje*

BERHEVKAR: ROŞAN LEZGÎN



ji xwe re xwest, qelenê wê da û daweta xwe li dar xist. Dema berbûriyên Kejê hatin û ew kirin bûk, li hespê siwar kirin û birin. Salo jî bi stûxwarî li dû wê nêrî û qîrîn ji dilê wî çû. Salo, rabû berê xwe da alî odê û ji Ferhan Axa re got:

– Axa bi xatirê te.

Ferhan Axa tê de şaş û metel ma û got:

– Lawo Salo, ma te xêr e! Ecela te çî ye? Tu yê bi ku ve herî lawo? Ez ji te razî û tu ji min razî, ma çima bi xatirê

niha dibêji, êdî ez çî bikim.

Salo, rabû xatir xwest û berê xwe da alî mala xwe. Lê belê, taya evînê ketiye bedena Salo û tîra eşqê lê ketiye. Tu tebat nayê kê. Salo, ev car rabû xwe bi axatî û rumanî girêda û berê xwe da bajarê Palo. Çend caran di ber derê lawê mîrê Palo re çû û hat. Bala lawê mîrê Palo pê ket ku ew û jina xwe Kejê li balkona qonaxa wî de rûniştine. Lawê mîrê Palo jê rik girt û ji xwe re got; Gelo ev kî ye? Lawê mîrê Palo zivirî ji jina xwe



# Awazek ji bo azadî û wekhevîyê:

## Razî dil

Têkoşîna gelê kurd ne tenê li dijî dagirkeran, her wiha li dijî bandora neyinî ya dabaşbûna hestî û derûnî ye jî. Lê têkoşîna siyasî bi serê xwe têrê nake ku ew sînor hilweşin, lewre jî di aliyê çand û hunerî de gelê kurd hev û din baş nas bike. Teknolojî û alavên ragihandinê vê riyê li ber me vedike. Lê divê kes û saziyên ku xebatên rewşenbîrî dikin, zêdetir hewl bidin xwe ku hev û din nas bikin.


Astengî li ber vê xebatê gelek in, ne tenê hest raman ji hev dûr ketin her wiha jî, ziman û alfabe ji hev cuda ne. Piraniya kurdên başûr û rojhilat xebatên xwe bi tîpên erebî û zaravayê soranî diweşînin. Ew jî dibe sedem ku piraniya kurdên Bakur ji wan berhemana tişteki fêr nekin.

Lê bi geşbûna tevgera azadîxwaz, xebatên çand û hunerî jî geşbûn. Îro gelek berhemên zaravayê soranî li kurmancî tê adaptekirin, an jî berhemên bi tîpên erebî, li tîpên latînî tîr wergerandin. Weşanxaneya Sara ku xebata xwe li Swêdê xebatên xwe didomîne, rêbazêke nû ceribandîye, pirtûkek hem bi tîpên latînî hem jî bi tîpên erebî weşandiye. Di nava vê pirtûka bi navê "Razî dil" de helbestên Peşew Merîwanî cih digirin. Li gorî agahiyên ku di pêşeka pirtûkê de cih girtine, hinek helbestên ku di nava pirtûkê de cih girtine, ji aliyê Merîwanî de di destpêka helbestvaniya wî de hatine nivîsîn. Ji ber vê yekê nivîskar didê xuyakirin ku hinek jî

wan helbestên lasayî yên helbestvanên din in. Dîsa li gorî daxuyaniya helbestvanê navborî, mamoste Hêmin ji pirtûka wî re pêşeke nivîsiye, lê ew pêşek di sala 1959'an de di şerekî li dora Sine de winda bûne.

Di helbestên Merîwanî de bi giranî rewşa kurdan, penaberîya wan, pesnê bedewiyê û evîn hene. Di helbesta yekemîn a bi navê "Ey mang" de helbestvan di navbera zerbûna heyvê û zeriya gûnê xwe de tîkiliyek daniye. Ew zer bûna heyvê bi tîrsa ji tavê ve girê dide, lê zerbûna gûnê wî ji ber derdê evînê û dûrbûna ji yarê ye.

*Ey mang  
Ey mang bo çî zerd î guwaye toş wêk min  
Cergit be tîr leykirawê kun kun?*



SARA

*Ey mang,  
xo rast e zerdî  
her zerd e  
Zerdî ber-  
hemî henasey  
serd e  
Zerdî to le  
tîrs beyan e  
Zerdî min le  
bo dûrî yaran  
e*

(...)

Digel hestên neteweyî, hestên çînayetî jî di helbestan de balê dikişînin. Bo nimûnê di helbesta bi navê "Newroz" de, helbestvan balê dikişîne ser xizaniyê û ji zarokê xwe re dibêje heke ez nikarim destegulê bikirim, ezê di cihê destegulê de xwîna dilê xwe pêşkêşî te bikim:

*(...)  
Em sal ger nembêt gulet bo bikirim  
Şert bêt be xencer ziki xom bidirim  
Pencem sor bikim min be xwênî dil  
Biyem be to giyana le cêyî çepkegul  
(...)*

Helbesta bi navê "Ta be key" ku li

ser şehîdbûna fermanîdarekî dilsoz hatiye nivîsîn, xayîniyê bi van gotinan şermezar dike:

*Besiye hetîw ta be key  
Nanî napiyawî dexoy  
Çek werdegirî le dijmin  
Bo riştî xwênî min  
Deb le nêw des dijminan  
Hêriş dijî Kurdistan?*

(...)

Di helbesta bi navê "Her kurd e" ku li ser daxwaza mamoste Hêmin di şevbuhêrêke edebî de hatiye xwendin, rewşa kambax a Kurdistanê tîne zimên, mamoste Hêmin jî vê rastiyê wekî rastiya tehl bi nav dike:


*Her kurd e  
Kurd e jiyani pir e le matem  
Kurd e laremîl ereb û ecem  
Her kurd e daîm, dest be dawên xem  
Kurd e, estêrey, bextî geş nebû  
Her kurd e pencî qet be şer nebû  
Kurd e wa le jîn xawenbeş nebû  
Kurd e ke le jêr alayî bêgane  
Awa dekêşê cefayî zemanê  
Kurd e bedbextî dêt be daman e  
Her kurd e derdî wa bêderman e  
(...)*

Di nava pirtûkê beşek jî ji helbestên bi zaravayê hewramî re hatiye veqetandin. Her wiha piştî ku helbestvan derketiye derveyî welat, evîn û bêrikirina ji bo welat zêdetir di helbestan de xwe dane der.

SAMÎ BERBANG

## Hêz û zimanê olê

OSMAN ÖZÇELİK



Li Moskovayê, li kêleka "Qada Sor" avahiyek rengîn bala min kişandibû. Avahî bi rengê şîn, pembeyî û binevşiyêke lihevhatî hatibû boyaxkirin. Boyax nû bû, lê belê ji qesirbendiya avahiye dixuya ku li gorî teknolojiya sedsala 10-11 an hatibû ava kirin. Nû û kevn di vê avahiyê de di hembêza hev û din de heliya bû.

Li ser pîrsa min, ji mir re hat gotin ku ev avahî "dêr" e. Dêreke kevnar e. Tu nabêje, ev dêra kevnare piştî şoreşa sor a proleterya hatiye hedimandin. Ji ber ku "ol" afyon bû. Birjuwaziye li şûna afyonê oldarî dida damarên civatê û ew dikir xew. Wê proleterya û gel ji ol û oldariyê bi dûr bihata xistin. Di xuyaniyê de ol, ji holê rabû. Lê civat bi îdealên mirovahiyê yên bilind nehate motîve kirin. Xwezayê valahî qebûl nedikir. Votkayê şûna afyonê(ol)girt. Sistema bolşevîkan hilweşiya û piştî heftê salî Moskoviyan li quncika Qada Sor, dêra xwe

ya kevnare, li cihê berê û bi qesirbendiya kevn, feha berê ji nû ve ava kirine.

Di serê vê salê de Papa Jean Paul ê duyemîn çû Kuba. Kuba ya Castro. Serokê şoreşa sor a Kuba Castro. Li Kubayê jî dihat gotin ku, ol afyon e. Bi çûyina Kuba, Papa piştigiriyek mezin da Kastro, yê di bin ambargo ya aborî ya Amerîkayê de. Bi mehan Kuba ji serî heta binî hate paqijkirin, hate şuştin û veşuştin. Wêneyên Papa yên gewre bejna bajarên Kubayê xemilandin. Bi sed hezaran Kubayî hatin pêşwaziya Papa. Ola xirîstiyaniyê û Papa ji Kubayîyan re bû hêviyek mezin. Di vê hevdîtîne de Castro, mazûbantiyek qenc û îltîfatînin mezin pêşkêşî Papa kirin. Castro yê ateîst ê gerîla yê Çiyayê Sîestro Maestra, ji heyecanan şaş û metel ma û ji Papayê ruhban ê metafîzîk-parêz re wiha got: "Ez û tu ji mirovatiyê re, xizmetê dikin, em du melayket in" Bersiva Papa mîna şeqemê bû. "Tenê em du insan in"

Sosyalîstan bi hêza ol û oldariyê nizanibûn. Wan digot qey em li dijî olê propanganda bikin, wê gel dev ji ola xwe berdin. Piştî ku dîtî bazara malê li ya sükê derneket, êdî bi dereca îfratê di nav de diçin.

Osmaniyan ji sosyalîstan bêhtir bi hêza olê dizanîn. Osmaniyan dest diavêtin kîjan welatî, li wir ola îslamê belav dikirin. Bi fen û fût û fetwayê olî, împaratoriyeke ava kirin û şeş sed salî domandin. Ola îslamê ji bo Osmaniyan bû sedema dewlemendî û

dilgeşiyê. Lê mixabin ola îslamê, ji gelên bindestên osmaniyan re jî, bû sedema şêlandin, şûnde mayîn û xapandinê.

Împaratoriya Osmanî û komara neviyên wan her tim ola îslamê, di navbera dewletê û kurdan de kirine pir û bi vîrê xwe digîhîjînin kurdan. Kengî ku kurdan doza mafên xwe kirine, ola îslamê ji karbidestên dewletê re bûye mertal û wisa gotina: "Em birayên hev ên olî ne, ol û ala me yek e, hûn çî dixwazin!.."

Ola îslamê her carî bûye şala, ku pîrsgirêka kurd di bin de hatiye veşartin.

Îro bi milyonan kurd "deng"ên xwe ji bo xatirê ola îslamê didin partiya N.Erbakanê mizawir.

Ev serê hezar salî ye ku kurd û tirk cîran in. Bi gotinek din, tirk hatine bûne cîranê me. Ne ziman ne dîrok, ne muzîk û ne jî dansên me wek hev in. Tenê ola me û zimanê ola me yek e.

Kemalîstên laîk, li ser navê "reforma olî" dixwazin zimanê îbadetê biguhêrin, bi tirk bikin. Propagandayêke berfireh dikin ku, limêj, dua û Qur'an bi tirkî bête xwendin.

Ez dibînim alimên me yên olî li dijî vî daxwazê derdikevin û fena nijadperestiyê bi nav dikin. Zimanê îbadetê ha bi tirkî ha bi erebî. Ji me re çî ferq dike, her du ziman jî, ji me re biyanî ne.

Bihêlin, bila herkes bi zimanê xwe îbadeta xwe bike ku, kurdên oldar bikaribin bi zimanê xwe, xwe bişpêrin yezdanê xwe.



# Nasnameya Temel

# Heke ne ji min bûya

**T**emel, ji eslê xwe û Temel-tîya xwe fedî dikir. Got ezê xwe wilo biguherînim ku kes min nas neke. Çû dibistanê û baş fêrî tirkî ya Stenbolê bû. Piştî dibistanê perwerdehiya piyanoyê jî dît. Hingî baş hîni piyanoyê bûbû navê wî li Ewrûpa û Amerîkayê hate bihîstin. Ew vexwendin şahiyê li Amerîkayê. Temel, ji xwe ewle bû. Digot: "Ne gengaz e ku êdî mirov zanîbin ez Temel im, tew li Amerîkayê bi carekê ne gengaz e..."

Li şahiyê, dora wî hat û nêzîkî piyanoyê bû. Dest bi muzîkên cur bi cur kir. Temaşevan ji xwe ve çûn. Çepik, hela hela û hwd. Belê yekî bala Temel kişand. Ji nava temaşevanan yek:

Şabaş Temel, şabaş ji te re hemwelatîyê min...!

(Pîravo Temel, pravo hemşerûm sana...!)

Temel şaş û metel mabû. Ev çi bû? Ev kî bû? Wî çawa ew nas kiribû? Temel nepeyivîbû. Heke bipeyiviya jî zaraveyê xwe gu-



hertibû. Bangî wî temaşevanî kir, jê re got.

- Tu bi Xwedê dikî te çawa zanîbû ez Temel im?

Yê temaşevan:

- Pir hêsan bû... Dema tu hatî ber derxûna piyanoyê min fêm

kir. Lewre mirovên piyanîst dema têne ber piyanoyê kursiyê xwe ber bi derxûna (mane) piyanoyê ve dibin û li ser rûdinin, lê tu hatî, berê tu li ser kursiyê rûniştî û te piyano ber bi xwe kişand...!'

ÇIYA MAZÎ

**G**undiyên Mêgerê pir çeleng û di kar de jêhatî ne. Reşo yekî jî vî gundî bû. Bi şev û roj kar dikir. Bi roj diçû tûtînê û bi şev jî ev tûtîn rêz dikir. Dema pembo, diçû pembo dida hev û dema zivistan dihat, diçû metropolên tirkî ji bo birîna daristanê.

Dem a pembû diçûnê nedixwest ku kesek jê bêhtir biçine. Ji bo xwarinê jî bêhna xwe venedikir. Dem a xwarinê dihat nanek dixiste destê xwe û dixwar. Lê dem a ew nan jî dixwar betal nedima.

Wê gezek li nanê xwe xista û nanê xwe biavêtaya pêşiya xwe. Hetanî diçû ba nên pembû diçûnê, ku digihasse nên, dişa gezek lê dixist û dişa diavet pêşiya xwe. Werê nanê xwe jî dixwar.

Reşo diravên xwe dane hev û ji xwe re pê trextorê kirî. Lê nizanîbû ajovanîyê bike. Destê wî lê nedigeriya ku bi ajovanekî diravan bigire. Rabû ser trextorê got: "Ez ajovan im...!"

Bi hefiketiyekê trextor şixuland. Bêhnêkê pê geriya, lê îcar nikarîbû bisekinanda. Bangî jina xwe kir, bangî gundiyan kir. Gundî giş li dora wî kom bûn. Ew jî hey li dora tahtekê dizivire. Li aliyekî jî bang dikir:

- Ji min re kevîran biavêjin pêş, kevîran biavêjin pêş...!

Kevîran jî pê re nedikir. Trextor di ser kevîran re jî derbas dibû. Dişa bang kir:

- Kani weris binin û li pêşiya trextorê vezelînin...!

Çalêk jî li nêzîkî wan bû. Ku di çalê werbûya, perçê mezin guhê wî bû. Gundîyan weris anî û li pêşiya trextorê vezelandin. Bi zorê trextor sekinî. Reşo bi helke helk jî ser traxtorê daket û got:

- Heke ne ji zîrekiya min bûya wê trextor di çalê werbûya...!

## BI XELAT... XAÇEPIRSA BI XELAT (106) XAÇEPIRSA

Şikandî muzîkê	E	Şikandî Schalk (Woz)	E	Rûnarê Xuyang	S	Navêk	Ş	Bi adê Nûreyk	Ç	Tipek
AK	OR	D	Sermaz Gelo	R	Û	R	E	S		
Çelêk Çimavê	E	S	K	M	O	Vegetandê Dawera yekê	E	K	Xwelî	
Gûzavêk	Û	Gidêkê Açê Jenavêr Bi şig. çay	M	I	T	Bi piş Tê Têgira Lewayî	A	D		
Nawerêk Çimavê Kurdîstanê	T	Dawera berê Kêşê Gêr	A	B	Dawera arganê	A	Paşgêrêk Çudêr	B	A	R
Ş	E	N	G	A	L	Getî Zîlavêr	P	A	R	I
Bi hawî Açê Dawera Ame	A	D	I	R	Bi deravê ku Tipek dergeşêr	K	E			
Tevrêk Bîrîn	A	Ş	E	F	Paşgêrêk Dawera Plavê	L	U	T		
Çimavêk	E	V	Z	Mehê	T	A	X			

PEYVA VEŞARÎ → ÇARENÛS

**Bersiva Xaçepirsa 104'an**

Xaçepirsa me bi xelat e. Di 15 rojan de çî bersiv bigihîjin destê me, emê wan binirxînin û bi rîya pişkê li 5 kesan belav bikin. Xelata hejmarê me ya 106'an salnameya Özgür Halkê ya 98'an e.

**Jêrenot:**  
Ji bo ku bersiva we bê nîrxandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî navnîşana xwe ji me re bişînin.

Pênc kesên ku xelata hejmarê 104'an Kaset a Koma Dengî Biratî "Narinê" qezenc kirine: Muzafer Dağ/Mêrdîn, İ.Halil Gündüzalp/Riha, Baran Karadağ/Izmîr, Hayretin Şen/Stenbol

Siyasetme darek	Baneşanek	Amûrek muzîkê	Tipek kurdi	Wisa, wilo	Feditî
Siyasî	Fûze	Yan	Dawera iyotê	Westiyayî	
8			5	Rêveçûn Dawera nikelê	
Tûj		Dendarên 'nebî'	Naçe Alavekî dew kîlândinê		
Meslek		Vegetandê kek			
		Piştî duayan tê gotin Zekem			Tipeke dengdar Vegetandê kek
Tekane				Zebeşê... Jinên ku diçin bûkê tînin	4
Beşeke ji laşê mirov		Bedbînî			
9		Sewal			
Bi hejmarên romayê 50 Jinap	Kûçik (berepaşki)		Bi kirdkî 'ku'		
	Paşgêrêk		Dawera azotê		
1				Tipek Notayek (berepaşki)	
Encam			Bi farisî av		
Çinavkek			Tipek dengdêr		
2	Dengdarê 'ala'	Lêborîn			

PEYVA VEŞARÎ →

1 2 3 4 5 6 7 8 9





## Kerdenê vatenan kenê zûrî

Çend rojî yo Mesut Yılmaz û serdarê dewleta tirkê bînê, nînan anê ziwan, la belê kerdênê ke nê heftî miyan de HADEP rê virazyay, rasfî îyê vatenanê Mesut Yılmaz û serdaranê bînan kenê zûrî.

Serokwezîrê dewleta tirk Mesut Yılmazo çend rojî yo vano: "Ezo qandê demokrasiya bêkemî qanûno newe kena hedre. No qanûn ke vejya demokrasiya bêkemiya tirkîye de cayê xo bigiro. êkê nameyê cinê çetan û karanê lîmînan miyan de ravêrenê pêroyê înanê bidîyê mahkama û haqtê pêrin de dahwaya abyo."

Çend rojî yo Mesut Yılmaz û serdarê dewleta tirkê bînê, nînan anê ziwan, la belê kerdênê ke nê heftî miyan de HADEP rê virazyay, rastî îyê vatenanê Mesut Yılmaz û serdaranê bînan kenê zûrî. Çimke nê heftî miyan de xeylê banênê partî û keyanê serokan, sermiyan û endamanê partî rê vardayî-nî virazyay û xeylê serok, sermiyan û endamanê partî polîsanê siyasiyan girotî binçim. Heveyê rojo didin viradiyay û ê binî hewna nêviradiyayê û polîsê înan şaxê siyasî de

tepsênê.

Vardayino siftayin polîsanê siyasiyanê Stenbolî hiriyê na meng de banê HADEP'a Gazîosmanpaşay rê viraşt. Û polîsan zek banê partî talan kerê, heme cayê banê partî qulik qulik geyray, sekreterê şaxê partî Azad Kaya, endamanê partî ra Fikret Aksoy, İnan Bingöl, Adil Bulut, Mehmet Poyraz, Tahir Tuş, Rifak Yeşilfiden, Erkan Özkul, Ramazan Bingöl, Nuran Uğurlu, Emin Akasım, Mehmet Bağcı û vilakarê rojnameyê ma Edip Bilge, girotî binçim. Badê di rojan Adil Bulut, Nuran Uğurlu, Tahir Tul û Mehmet Poyraz binçim de ternay, ê binî viraday.

Ancî o roj, polîsanê siyasiyan ê Stenbolî, badê deyira banê HADEP Stenbolî rê vardayin viraşt û nezdîyê çehar seatan banê partî de qareqol na ro, hene cayê partî qulik qulik qeyra û şî. Nîmeyê şew de jî keyeyê sermiyana Stenbolî Delal Eren rê vardayin viraşt û a jî girot binçim. Ancî a şew keyayanê serakanê HADEP'a Beykoz, Ümraniye, Kadıköy, Fatih û Kartalî rê vardayin viraşt û serokê nê şaxan girotî binçim. ê Ümraniye rojo bîn, ê Kadıköy rojo didin viraday. Serokê şaxanê bînan, polîsê şaxa siyasî de tepişênê. Gorey dazanayina HADEP polîsan 3-4-5 meng de nîmeyê şew de xeylê keyanê endamanê partî rê vardayin viraşt û xeylê endamî girotê binçim û iyê hewna binçim de yê.

### Geylanî: Vardayini bêqanûnî yê

Vardayinan pey ra Sekreterê Giştîyê HADEP Hamit Geylanî 5'ê meng de vardayinan ser, eşkerakerdin viraşt. Geylanî eşkerakerdin de vardayini protesto kerd û vat: "Vardayinê ke, banênê partîda ma rê virazyay, qanûnî niyê. Çimke wexto ke, banênê partîyanê siyasiyan rê vardayin virazyo, gerek biryarê mahkama bibo. La belê vardayinê

nê ke, banênê partîda ma rê bî, biryarê mahkama çinyo. Biryara ke mahkama da, o qandê banê partî nêdiyawo, qandê kesan diyawo. La belê polîsan goreyê biryarê mahkama nê, goreyê xo, ze ke banê partî talan kirê, heme cayê banê partî qulik qulik geyrayê."

Geylanî qiseyê xo wina ramitî: "Hikûmatê Anasol/D wo hemû eşkerakerdinê xo de reformanê siyasiyan sero, serkomar Demirelo jî Demokrasiya bêkemî ser qisey kenno û qiseyanê demokrasiya pêşkêşê şarî keno kiştâ bîn ra jî partîda ma rê vardayinê virazyenê. Polîsê sermiyan û endamanê partiya ma genê binçim. Bêguman nê kerdanan û vardayan ser, mayê vatenanê Hikûmatê Anasol/D û Demirelî de teredût kem."


Sekreterê Giştî yê HADEP dazanayin ke, dewleta wina kerdina, wazena verê xef-tiyayanê ci bigiro û şarî HADEP ra dîrî fîno. La belê nê vardayin û kerdênê meşê verê xef-tiyayan û girdbiyayinê HADEP bigirê û embazê ci nê ke, polîsan girotê binçim ê jî hema viradiyê.

### Reaksiyonê ÖDP û EMEP

Serokê ÖDP'ya Setbolê Mehmet Atay jî vardayin ser 5'ê meng de eşkerakerdin viraşt. Atalay eşkerakerdin de vardayini protesto kerdî û wina vat: "Vardayinê ke banênê HADEP rê virazyenê girêdayinê mese-la kurdê û gerek kes nêvardayinan mesela kurd ra ciya mefikirî yo." Ancî serokê ÖDP wast ke, vardayinê ke, şarê kurd re virazyenê wa dewlet peyê nê vardayinan biyaro û êkê binçim de tepşiyenê wa ê jî hema viradiyê.

Serokê EMEP'a Stenbol Mehmet Kılıçaslan jî vardayini protesto kerd û vat: "Ne vardayin û kerdanan ra oyo ayseno ke Tirkîye de demokrasiya çinyo endam û sermayanê ke binçim de tepşiyenê hema viradiyê."

MEMED DREWŞ



Sekreterê Giştî yê HADEP'ê Hamit Geylanî

**WELAT**

ISSN 1301/7497

Rojnameya Hefteyî  
(Haftalık Gazete)

Li ser navê  
Zerya Basın ve  
Yayınçılık  
San. Tic. Ltd. Şti.  
(adına)  
Xwedî (Sahibi)  
CELALETTİN  
YÖYLER

NAVNİŞAN  
Ayhan Işık Sk. No:23/3  
Beyoğlu / İSTANBUL  
TEL-FAX:  
(0 212) 251 90 13

Gerînendeyê Weşanê  
(Yayın Yönetmeni)  
SAMİ TAN

Berpîrsê Karên Nivîsaran  
(Yazı İşleri Müdürü)  
M. SALİH TAŞKESEN

Berpîrsê têkiliyên bi gel re  
(Halkla ilişkiler müdürü)  
REFİK İNCİR

Berpîrsê Saziye  
(Müessese Müdürü)  
TAHİR ELDEMİR

ÇAPXANE  
Yeni Asya Matbaacılık  
A.Ş.  
BELAVKIRIN  
BİRYAY Dağıtım

NÜNERİTİYÊN ME  
(Temsilciliklerimiz)

**Munchen:**  
(Nünerê Giştî yê  
Ewropayê)

Mahmut Gergerli  
49 871 67 08 15

**Brüksel:**  
Medenî Ferho  
32 532 721 12 03

**Suriye:**  
Jana Seyda  
Helim Yûsiv

**Berlin:**  
Silêman Sîdo  
00 49 30 691 6495

**Hannover:**  
Selîm Biçûk  
49 572 18 13 60

**Stockholm:**  
Robin Rewşen  
46 87 51 05 64

**Bonn:**  
Ahmet Baraçkılıç  
49 228 66 62 49

**Hollanda:**  
S. A. Fewzi  
31 104 85 55 43



ÛLKEDE

# Ji Gündemê

## Ji editora Û. Gündemê

### RROJHILAT NAVÎN BER BI QEWIMÎNÊN NÛ VE DIÇE

Heftaya borî du mijarên ku derketin pêşberî me ji layê naveroka xwe ve girîng bûn. Yek ji wan Rapora Susurlukê ya ku Serokê Lijneya Teftîşê ya Serokweziriyê Kutlu Savaş ragihandibû, ya din jî helwesta êrîşkar a Amerîkayê li dijî Iraqê bû. Ji ber ku her du mijar jî ji bo cografyaya ku em tê de dijîn girîng in, bêşik ew bûn mansetê ji Ûlke de Gündemê re.

Aliyê herî girîng ê Rapora Susurlukê ev bû ku, tiştên bi sal in ku çapemeniya azad dibêje, dipejirîne, ango êdî rapor bixwe jî dibêje ku di serî de Musa Anter, hevalên me yê rojnameger, rewşenbîr, karbidestên welatparêz ên kurd, ji hêla kesên tarî ku di bin baskên dewletê de ne, hatine kuştin. Mixabin rûpela 75 an a raporê ku kuştina rojnamegerên kurd tê de derbas dibû hatibû sansurkirin. Ev rewş diyar dika ku di kuştina hevalên me yê rojnameger de tiliya rayedar û generalên dewletê heye.

Di raporê de xaleke balkêş jî ew e ku her wekî doh îro jî qetliamên ku hatine kirin tîr parastin û pejirandin. Girîng bû ku şewaza qetliamwarî ku ji hêla medyaya îkîtelîyê ve ji çavan hatibû dûrxistin, ji bo ku di pêşerojê de li hember qetliam û înfazên bêdarizandinî bicîhbûne muxalefeteke rastîn pêk were, derkete pêş. Lewre jî me ev yek di rûpelên xwe de teşhîr kir. Ev rewş heta ku çareserîya pîrsa kurdî pêk were de wiha bidome.

Mijareke din ku herêma me eleqedar dika şewaza êrîşkar a Amerîkayê li dijî Iraqê û bandora wê li herêma me bû. Hilberînerê herî mezin ê çekan DYA yê, bi hinceta ku di destê Iraqê de çekên kîmyewî hene amadehiya êrîşekê xedar dika. Li hemberî gelê kurd bikaranîna çekên kîmyewî, tevgera ku her gay raya giştî ya demokrat, welatpazê û şoreşger reaksiyon nîşan daye ye. Lê armanca Amerîkayê gelek cuda ye. Amerîka ji aliyekî ve bi êrîşekê li dijî Iraqê rola xwe ya cendermeyî dide tescîl kirin, ji aliyekî ve dixwaze çavên gelên bindest bitîrsine, ji aliyê din ve jî dixwaze reklama teknolojiya xwe bike.

Her wiha DYA di serî de Tevera Azadî ya kurd, jî bo ku li Rôjhilata Navîn hemû hêzên dijberî xwe tîk bibe, dest bi tifaqên qirêj dika. Lewre jî wê di rojên pêşiya me de, qeyrana kendavê (korfêz krîzî) wê ji mansetên me re bibe mijara sereke.



Rêlibergirtin û zordariyên li ser rojnameya Ûlke de Gündemê dom dikin.

### 2 reşemî 1998 Duşem:

#### 4 HEZAR KES BEŞDARÎ CENAZAYÊ GERÎLA BÛN

4 hezar kes beşdarî merasîma cenazeyê gerîlayê PKK'ê ku li Tokatê tevî 2 hevalên xwe jiyana xwe dest dabû, bûn. Girseya gel ku serê sibê li ber Cemxaneyê Gaziyê civiyabû, alên ERNK ê û dovîz û pankartên ku navê ARGK û PKK li ser hatibûn nivîsîn û tevî darbista gerîla Adnan Şeker, ber bi goristana Gaziyê ve meşiya. Her çiqas di merasîmê de cigirê Berpîrsê Emniyeta Stenbolê Hüseyin Arpacı xwest ku ala PKKê deynin xwarê jî, xwepêşandanan ev daxwaz bi cih neanîn.

Girseya gel ku darbista Adnan Şeker bi rengên kesk û sor û zer û kulîkên sor xemilandibû, li ser Kolanî İsmet Paşayê raştî bendava polîsan hatin, lê bi biryariya gel kir ku polis li ber girseya gel vekişin paş. Piştî ku gel gihîşt goristanê jî bo Adnan Şeker kete rawestîna rêzgirtinê. Adnan Şeker tevî sloganên "lêxe gerîlê Kurdistanê ava bike" û axaftinên kurdî hate hilandin.

### 3 reşemî 1998 Sêşem:

#### TÛĞIAD: BÊYÎ PKK'Ê ÇARESERÎ NABE

Di berhevoka 'Genç Bakış' ku ji hêla TÛĞIAD (Komeleya Karasazên Ciwan ên Tirk) tê weşandin

de, bi sernavê: 'Çareserîya Kêşeya Kurd' nixrandinek hate kirin. Di nixrandinê de tê diyarkirin ku ji bo çareserîya pîrsa kurd muxatab PKK ye. Nivîs balê dikişîne ser hêza PKK'ê ya li herêmê, di rojevîbûna pîrsa kurdî de rola PKK'ê û hwd.

Her wiha di nixrandinê de, rê li bergirtina hêzên azadixwaz, astengkirina xebatên HADEP ê bi riya bendavên hilbijartina û girtina DEPIyan tê rexnekirin. Lê hêla din tê diyarkirin ku gelê kurd jî hêla Enqere ve ne wekî netewê û ne jî wekî hindikahî tê pejirandin.

### 4 reşemî 1998 Çarşem:

#### CEZA LI YURDAPAN, KANAR Û CEYLAN HATE BIRÎN

Ji bo endamên Heyeta Hewldanên ji bo Aştîyê (BİBA) Şanar Yurdapan, Ercan Kanar û Münir Ceylan, bi mebesta ku der barê "Qetlima Basa (Güçlükonak)" yê de daxuyaniya çapemeniyê dane û bi vî yekê jî Serkaniya Giştî a Tirk di bin gumanê de hiştine, 10 meh ceza hate birîn.

Di danîşîna dadgehê ku roja 3 ê reşemiyê pek hat de, sendikavan Münir Ceylan got ku tîkiliya çeteya dewletê ku di bûyera Susurlukê de derket holê bi vî qetliamê re heye. Her wiha Ceylan daxwaz kir li jineya mahkemeyê rapora Susurlukê di bin çavan re derbas bike. Şanar Yurdapan jî di dadgehê de wiha got:

Qetliam hê jî ronî nebûye. Lê vî derê divê di cihê me de Çevik Bir ê ku xwestiyê qetliam veşarî bimîne, bihata darizandin."

### 5 reşemî 1998 Pêncşem:

#### LISTİKA MÎT-PDK Û MOSSAD Ê

Dewletên Yekbûyî yê Amerika yê lez dide amadehiyên xwe yê ji bo êrîşkirina Iraqê û avakirina dewleteke tirkmenan li başûrê Kurdistanê. Rayedarên Rêxistina îstixbarata tirk (MÎT) bi koçberên tirkmen ku ji Kerkukê koçbûne re hevdişînek pêk anî. Di hevdişîna ku hinek derdorên kurd jî beşdar bûn de, berpîrsên MÎT ê dan zanîn ku wê hêzên artêşa tirk bikevin bajarê Kerkukê. Her wiha MÎT ê pêşniyar kir ku ji tirkmenan kesên alîkariya îstixbaratî û lojîstîkî bidin wê artêşa tirk 150 dolar meaşê li wan bide wan. Li hêla din peywendiyên Tirkiye û Rêxistina îstixbarata İsrailê MOSSAD, ku di rapora Susurlukê de derbas dibe, êdî Başûrê Kurdistanê jî dixê bin baskên xwe. Li navçeya Serê Reş ku biryargeha PDK'ê lê ye, MÎT û MOSSAD'ê navendeke hevpar ava kirine û gelek kesên PDK yî perwerde dikin û ku ji van çend kes jî hêla İranê ve hatin girtin. Hate ragihandin ku ji 28 PDK iyan ku hatine girtin 16 ê wan jî eşîra Barzanî ne.